SERKOMARÊ KURDISTANÊ LI BER DADGEHA ÎRANÊ

Amadekar: Bedredîn Salih

Samî Ergoşî
JI Soranî Kiriye kurmancî

2007

چاپخانەی رۆشنبیری

SERKOMARÊ KURDISTANÊ LI BER DADGEHA ÎRANÊ

Amadekar: Bedredîn Salih

Samî Ergoşî
Ji soranî kiriye kurmancî

2007

Navê Pirtûkê
SERKOMARÊ KURDISTANÊ LI BER DADGEHA ÎRANÊ

Amadekar
Bedredîn Salih

Kurmancî û Kompûter
Samî Ergoşî

Pêşgotin..

Dema ko di tîrmeha 2000-ê de, le Selahedînê hevalê min Bedredîn Salih ji nişka ve ket odeya min ya Kurdistan TV û di destê wî de ev nivîsa li jêr hebû, beriya ko li nivîsê binêrim, min qed bawer nedikir ko ezê rojekê ji rojan vê nivîsê bibînim û zanibim ka pêşevanê kurd, serkomarê Kurdistanê Qazî Mihemed û hevalên wî li Mehabadê çawa hatine dadgehîkirin û di wê dadgehîkirinê de çi derbas bûye. Dema ko min dest bi xwendina wê kir, bi awakî welê ketim bin bandora wê, te digo qey ez bi xwe di rûniştina dadgehîkirinê de amade me, bawer dikim ev yek dê ji bo we jî tiştekî pir balkêş be.

Bedredîn ev nivîs ji pirtûkek farsî bi awayekî ji Îranê bi dest xistibû û wergerandibû ser soraniyê, wî ji min xwest ko soraniya wê bikim kurmanciya bi tîpên latînî û bi herdu awayan jî em wek pirtûkek biweşînin. Bi rastî jî gelek û gelek karên min hebûn û ez pir mijûl bûm, lê belê ev nivîs tiştek welê bû ko qed nedikaribûm bêjim na, lewra jî bê yek û du min qebûl kir û di nava çend rojan de min kire kurmancî.

Helebt ji ber gelek sedemên ko kurd pê dizanin, çi qasî ji destê wan hatibe, dagîrkerên Kurdistanê nehiştiye ko kurd dîroka xwe zanibin û hertim jî her tiştê kurdan yê dîrokî ketibe destê wan, winda kirine û rê nedane ko haya ti kesî ji wan çê be, hinek dokumentarên weke vê nivîsê jî ko hene, di refên tarî û nepenî de veşartine û çi qasî ji wan bêt, dê rê nedin bikevin destê kurdan, lê belê dimîne ka kî û kengê û li kû, kurdek, yan dilsozekî kurdan derfetê bibîne û tiştên weha ji tarîtiya wan cihan derxe û roniyê bibînim. Bi hêviya ko paşerojê ev derfet mezin û zê de bibin.

Belê, di vê nivîsê de beşdarekî rûniştina dadgehîkirina pêşevan Qazî Mihemed û hevalên wî Sedr û Seyfî Qazî, hemû gotin û bûyerên dadgehîkirinê rekord kirine û wê demê ji bo hin aliyên taybet yên Şah û leşker û hukûmeta Îranê çap kiriye, lê belê piştre ev yek wek eşekerekirina nepeniyên

leşkerî û weke gefek li ser ewlekariyê hatiye qebûlkirin, di cihekî taybet yê nepenî de hatiye veşartin û arşîvkirin. Îro piştî derbasbûna ew qas salan, va derdikeve ber ronahiyê û yek ji bûyerên herî balkêş ji kurdan re radixe ber çavan. Bi hêviya ko di paşerojek nêzîk de, emê karibin berhemên din yên weha pêşkêşî xwendevanê kurd bikin.

Samî Ergoşî
Selahedîn
Hezîran - 2005

Teksta dadgehîkirina pêşevan Qazî Mihemed û Sedr û Seyfî Qazî

Di derbarê dadgehîkirina pêşevan Qazî Mihemed û Sedr û Seyfî Qazî de, pir hatiye gotin û nivîsandin, diyar e ko ev nivîs du grûp in, grûpa yekê ew kes in yên ko xwestine dîrokê vajî bikin û li gor berjwendiyên dijminên kurdan, tîtal û gotin û tiştên dûrî wan zatan nivîsandine û hewl daye wê dîrokê vajî bikin, lê belê xuya ye berê rojê jî bi bêjingê nayê girtin, belgeya me jî dilsozî û evîna gelê kurd ya ji bo qaziyan û rêça pîroza wan e.

Grûpa duyê ya wan nivîsan jî, ew rêzdar in yên ko ji dilsoziya xwe şevbêr mane ji bo ko qul û valahiyên veşartî yên karesatê, ango rûxiyana komara Kurdistan û bidarvekirina pêşevanê wê eşkere bikin. Ya ko niha li ber destê we ye, teksta wê nivîsê ye, ya bi xameya efser (Kiyomers Salih) yê nûçegihanê kovara artêşa şahenşahiya Îranê hatiye nivîsandin ko welê diyar e bi xwe beşdarî dadgehîkirinê bûye. Teksta vê dadgehîkirinê wek wêjenameke taybet çap kiriye û pir bi nepenî li efserên mezin û cihê bawera Şah û payebilindên hukûmetê parve kiriye.

Ev hejmara taybet ko bi navê (Tac Kiyanî) hatiye nivîsandin û li (Stad) Bingeha Navendiya Fermandariya Artêşê hatiye arşîvkirin, me wergirtiye û wergerandiye kurdî.

Girîngiya vê belgenameyê ew e ko efser Kiyomers Salih wek nûçegihanekî aktîv û jêhatî bi xwe beşdarî dadgehîkirina pêşevan Qazî Mihemed û Sedr û Seyfî Qazî bûye, navhatî ji ber ko xwarziyê serleşker (Fereydûn Cem) yê mêrê (Şems) ya xweha Şah bû, lewra cihê bawerî û piştrastiya Şah bû, her ji ber vê yekê jî hemû nameyên nepenî yên Şahê Îranê li ber destê efser Kiyomers Salih bûne, ji bo ko her di nava heyamekê de, hinek ji wan di belavoka taybetî de ji berpirsiyarên leşkerî re bêne çapkirin, yan piştî ko têne organîzekirin, bişînin Namexaneya Nepenî ya Artêşa Îranê.

Welê diyar e ko ev name ji bo bawerîçêkirin û dilgermiya efserên artêşa Îranê bû, herweha heta niha jî name, yan rojnameyên çap dibin, dawiya salê tevan didin hev û ji bal Arşîvxaneya Serokatiyê ve têne çapkirin û parastin.

Ev ya li ber destê we jî, wek me li jor jî gotî, teksta wê nivîsê ye ya ko ji teksta dadgehîkirina qaziyan hatiye wergirtin û di wê wêjenameyê de hatiye çapkirin.

Bedredîn Salih
10-ê tebax 2000

Efser Kiyomers Salih dinivîsîne:
Piştî qediyana dadgehîkirina qaziyan û bidarvekirina wan, min ew bûyer tev, bê kêm û zêde di mehnameya (Mahname)-yê de weşand û nûçeyên girîng jî min di wêjenameya (Tac Kiyanî) de çap kirin, lê belê beriya ko bikeve ber destan û belav bibe, ez bangî dadgeha artêşê hatime kirin, li wê derê gote min: Tu bi sûça eşkerekirina nepeneiyên dadgehîkirina qaziyan tûmetbar î û pileya efseriyê ji min kişand, salekê jî cezayê girtinê li min hate birîn, ji ber vê yekê jî hem weşandina (Mahname) yê rawestiya û hem jî ev nûçe nehatin belavkirin.

Piştî azadbûna ji girtîgehê, sala 1947-ê Kiyomers ev agahdarî di hejmara 57-ê ya (Mahname) ya xwe de weşandine, herweha beriya vê yekê jî sala 1946-ê di hejmara 66-ê ya (Mahname)-yê de dinivîsîne: Pştî qediyana cenga cîhanî ya duyemîn û vegera leşkerê rûs û îngilîzan ji bo welatên xwe, artêşa Îranê kete livîn û tevgerê.

Her ev nûçegihan di hejmarên (44 - 64)-ê yên (Mahname)-yê de, bûyerên salên (1943 - 1946)-ê yên Kurdistan û Azerbêcanê jî vedigêre û piştre li ser komara Kurdistan û Azerbêcanê bi dûr û dirêjî nûçe û mijarên hûr û girîng weşandine ko hinek ji wan hatine arşîvkirin û hinên din jî çap bûne.

Di piraniya hejmarên (Mahname) - yê de, wefadarî û dilsoziya serokhozê dîbokrî, Elî Yar Esed û serokeşîrê mameş Qerenî Axa Eşayer û Reşîd Begê Herkî û Hesen Têlo û Quqyas Mamedî û Nûrî Begê Begzade û Mihemedemîn Çepê Herkî û Hemzeyê Qadirê Mameş û yên din, ji şahê Îranê û Derbara wî re, yan weşandine, yan jî di Namexaneya Artêşê de hatine arşîvkirin. Ya ji tevan entîketir, têkiliya Omer Xanê Şikak ya bi Derbarê re ye ko Omer Xan di dema fermandariya xwe ya hêzên leşkerê komara Kurdistanê de li Seqizê û derdorên wê, nêzî (17) name ji bo piştrastkirina Derbara Şah ji dilsoziya xwe ji bo Şahê Îranê şandine û di nameyan de xwe mîna serbazê Derbara Şahê Îranê qebûl kiriye û amadeyiya xwe ji

bo pêkanîna erk û fermanên Derbara Şah nîşan daye. Herweha ev name jî niha di Namexaneya Artêşa Îranê de, parastî ne.

Tê zanîn axayê dîbokrî, Elî Yar di namekê ji wan nameyên xwe de, bi têr û ferehî û bê kêmanî, agahdariyên li ser çawaniya çûyîna xwe ya bi Qazî Mihemed re ji bo bakûrê Azerbêcana Rûsya û civînên wan, ji Şahê Îranê re şandine.

Derfet niye ko em di vê kurtenivîsê de li ser naveroka wan hemû nameyan rawestin, lê belê di warê bandora naveroka nameyan de, ev nameyên Elî Yar dirba herî mezin bû ko bi komarê ket. Di derbarê rêjeya nameyan de jî, Omerxanê Şikak pirtirîn hejmara nameyan ji Derbarê re nivîsandine.

Di cih de piştî derketina leşkerê rûsî ji Kurdistanê, Omer Xan bi lez namek ji Şah re nivîsandiye û tê de ji Şah xwestiye ko çi qasî zû ye artêşa Îranê bigîje Kurdistanê û nivîsandiye: Va ye ez bi xwe tevî hemû hoza Şikak, wek serbazên Şahê Îranê amade me fermanên we pêk bînim. Her ji bo ko Derbara Şahenşa ji dilsozî û berfermaniya xwe piştrast bike, herdu kurên xwe yên bi navê Qadir û Lezgîn jî şandin cem Şahenşah li Tehranê, ji bo di dema hatina artêşa Îranê de ji bo Kurdistanê û bi taybetî jî ji bo bajarê Mehabadê, rênîşandêriya artêşê bikin û bibin çavsaxên wê.

Ji bilî Omer Xan, serokhoz û eşîrên din yên kurd jî ji bo piştrastî û rênîşandêriya artêşê û selimandina dûvelaniya xwe ya ji Derbarê re, kur û bira û kesên dilsozên xwe, şandibûn Tehranê.

Efser Kiyomers Salih dinivîsîne: Di roja 7-ê meha çileyê de, hin yekîneyên leşkerî yên Îranê ko tê de tobxane û tîrûbar û hin tank (Hin tankên kevnên jikarketî) hebûn, ji Tehranê ber bi Tewrêzê ve dabûn rê û sê rojan piştre, ango di 10-ê mehê de li derdorên bajarê Tewrêzê bi cih bûbûn, lê belê her bi bihîstina vê nûçeyê, hemû mezinên hukûmeta Azerbêcanê ber bi Rûsyayê ve reviya bûn û ji welat derketibûn, artêşa

Îranê jî ji bo ko piştrast bibe, heta roja piştre, ango 11-ê mehê, xwe ji ketina bajarê Tewrêzê, da alî.

Li vir efser Kiyomers Salih dinivîsîne: Dema ko bajarê Tewrêzê hate girtin, ez ji bo derxistina hejamereke nû ya Mahnameyê vegeriyabûm Tehranê.

Rojên piştre biryara çûyîna ber bi Kurdistanê ve, ji artêşê re derket, her ji bona vê yekê, yekîneyên leşkerî yên ko her ji serdema komara Kurdistanê ve li Sine û Kamyaran û Dîwandere, heta nêzî Seqizê bi cih bûbûn û carna jî bi leşkerê komara Kurdistanê re rastî pevçûnan dihatin, ji wan re biryara çûyîna ber bi Mehabadê ve derket.

Leşkerê Tehranê bi hin yekîneyên leşkerê Îranê re li Tewrêzê, ji bo ko bigîje hêzên me li jor navê wan anî, ji riya Qezwînê ber bi Kurdistanê ve da rê. Ev leşker di roja 19-ê meha çileyê de giha Mehabadê û pir bi lez efserên taybet ketin pey Qazî Mihemed û Seyfî û Sedr. Artêşa Îranê li padgana piçûka Mehabdê danî û li wir bi cih bû, her wê şevê bi bêtelê pêwendî bi Tehranê re danî û daxwaza çawaniya yeklakirina çarenûsa qaziyan kir, yên qazî jî di leşkergehê de girtî bûn. Pir bi lez bersîv ji Tehranê hat ko komîteya dadgeha meydanî ava bûye û va ye ji bo dadgehîkirina wan, ber bi Mehabadê ve tê.

Roja 26-ê çileyê komîteya dadgehê bi serokatiya kolonel Xulam Husên Ezîmî û dadger kolonel Hesen Kofaniyan û dadyarê sergurd Caferê Sanîî û di bin çavdêriya kolonel Emîr Hoşeng Xilitber de gihiştin Mehabadê û civîna dadgehîkirina qaziyan dest pê kir.

Efser Kiyomers dibêje: Ez jî di hemû rûniştin û civînên dadgehîkirina wan de amade bûm, rûniştinên dadgehê hin seetan berdeam bûn, pirsiyar û sûç ji bal dadger kolonel Hesen Kofaniyan ve dihatine berçavkirin, dikarim bêjim pirsiyar rona û zelal nebûn.

Behra bêtira sûçan ji bal qaziyan ve dihatin retkirin û qaziyan pir bi wêrekî daxwaza anîna belgeyan dikir, lê belê ji ber ko berê her li Tehranê sûçên wan hatibûn diyarkirin û her li wir jî biryara dawî hatibû girtin, biryar jî nebû ko ti belge ji wan sûçan re bêne berçavkirin, lewra rûniştina dadgehê wek rêzbendiyekê, piştî hin seetan qediya û piştî nîv seetê jî biryara bidarvekirina qaziyan hate pejirandin. Di rastiyê de, ev biryar li Tehranê hatibû girtin û her wê şevê jî biryar gihand qaziyan.

Sûçên Qazî Mihemed yên ko bi tûmeta wan birayara cezayê bidarvekirinê lê hate birîn, ev in:

1- Bazirganiya petrolê bi dewleta Rûsya re, bi rêjeya %51 ji dewleta Rûsya û %49 ji komara Kurdistanê re, bê razîbûna deweta navendî.

2- Guhertin û destkariya nexşeya welatê Îranê û cidakirina pênc parêzgehên Ormiye, Kirmanşa, Sine, Tewrêz û Îlamê.

3- Çêkirin û hildana ala ji komara Kurdistanê re, bi arma çakuç û das li ser awayê ala Rûsya.

4- Lêxistina sikeya pereyan ji hukûmeta Kurdistanê re li ser awayê Rûpiyeya rûsî û bi wêneyê Qazî Mihemed.

5- Çêkirina nexşeya Kurdistana mezin ya her çar perçeyên Kurdistana Îran, Îraq, Tirkiyê û Sûrya.

6- Anîna biyaniyan ji bo Îranê û danîna beşeke axa Îranê li ber destê wan, wek mînak, Mela Mistefayê Barzanî.

7- Xwarina gef û lafan li Şahinşahê Îranê û dewleta Îranê û ragihandina şer û handana xelkê Kurdistanê li dijî Şahenşa Aryamêhr.

8- Çêkirina peymanan bi hukûmeta Rûsya re li dijî hukûmeta Îranê û alîkariya hêzên dagîrkerên rûsî li tevaya axa Îranê.

9- Ragihandina serxwebûna hukûmeta Kurdistanê û dagîrkirina beşeke mezin ya axa Îranê li ser navê axa Kurdistanê.

10- Şandina kesan û hatinçûyîna derveyî welat û seredana Rûsya û rûniştin û civînên bi Baqrof yê serkomarê Azerbêcana Rûsya re.

11- Çêkirina peyman û bondên bazirganî bi biyanî û neyarên Îranê re, bê pirsa Tehranê.

12- Girtin û kuştina karmendên hukûmetê û rûxandina xaniyan û şewitandina malên wan, bi taybetî jî karmendên ne kurd.

Nivîskar û nûçegihanê (Mahname)-yê di berdewama vegêrana xwe de dinivîsîne: Qazî Mihemed pir bi tundî, bi tinê sê nebin, hemû sûçên din ret dikirin, sê sûçên ko ret nekirin, ev in:

1- Çûyîna Bakuya Azerbêcanê û hevdîtina bi Cafer Baqrof re.

2- Hebûna ala, lê belê ne weke mîna ko ew dibêjin çakuç û dasên li ser awayê ala Rûsya li ser bû.

3- Hatina Mela Mistefayê Barzanî, ew jî ne kesê ew anî be, lê belê ew bi xwe hatiye, ji ber ew kurd e û Kurdistan mala her kurdekî ye, mafê her kurdekî heye ko li her busteke axa xwe ya ew bixwaze bijî, ji ber maf yê xwediyê malê ye.

Sûçên Seyfî Qazî, yan jî Mihemed Husên Xanê Qazî, wezîrê ceng û cîgirê serokomar Qazî Mihemed:-

1. Çûyîna derveyî welat, Baku paytexta Azerbêcana Rûsya.

2. Çêkirina têkiliyan û civîna bi Pîşewerî yê serokomarê Azerbêcana Îranê re li Tewrêzê û civîn û çêkirina peymanan bi herdu serokomarên Azrebêcana Rûsya û Azerbêcana Îranê re, ango bi Pîşewerî û Baqrof re ko peymaneke sêkuçkeyî ya leşkerî bûye.

3. Wergirtina wezareta ceng ya komara Kurdistanê li dijî hukûmeta Îranê.

Sûçên Sedrî Qazî ko wek nûnerê gera 14-ê ya Meclisa Şûraya Millî ya Îranê (Parlemênt) ji bal xelkê kurd ve li Mehabadê û derdorên wê hatibû hilbijartin:-

1. Nivîsandina helbesteke bi coş û germ ji Mela Mistefayê Barzanî re û bixêranîna wî ya bi wê helbestê û pêgotina wî ya wek sembola pîroza gelê kurd.

2. Alîkariya Qazî Mihemed û wezîrên komara Kurdistan û hukûmeta wê û danîna rêwcihên hukûmetdariyê û avakirina karûbûrên hukûmetdariyê li Mehabadê.

3. Nivîsandina namekê ji Qazî Mihemed re ko tê de dibêje: Xwe bigirin heta alîkariya derve digîje we.

4. Handana xelkê li dijî hukûmeta Îranê û piştrastkirina berpirsiyarên komara Kurdistanê li Mehabadê ko êdî dewleta Îranê nikare bi komara Kurdistanê re şer bike.

Di derbarê hûrkariyên pêkhatina dadgehîkirinê de jî, Kiyomers Salih dinivîsîne: Rûniştina dadgehê bi qasî çar seetan berdewam bû û grûpa dadgehê piştî nîv seeta pirsîn û lihevguhertina dîtin û nêrînan, biryara bidarvekirina wan girt û bi riya bêtelê pêwendî bi fermandariya artêşê, ko wî çaxî Spehbed Erşedê Homayonî serokê fermandariyê bû, û general Acûdanî Şa li Derbarê û kolonel Fethulla Mînbaşyan re kir û ji wê derê ve biryara vegera Tehranê girt.

Heman şevê ji riya Miyanduwawê ve vegeriyane Tehranê û helbesta ko Ebulqasim Sedrî Qazî jî pê hatibû sûçbarkirin, her bi kurdî di hejmara 66-ê ya Mahname - Muselsil 153ê de hatiye weşandin, lê belê tê de tevliheviya hin peyvan û şaşiyên çapê jî hene, ji ber efser Kiyomers kurdî nedizanibû û welê diyar e yê ko tayp jî kiriye, wî jî kudrî nedizanibû ko bikaribin fonetîka helbestê bi başî binivîsînin û çap bikin.

Divê balê bikişînim ser wê yekê jî ko her di heman kovara wêjenameya Tac Kiyanî de, pir nivîsên hêja li dor komara Kurdistan û tevger û çalakiyên hunerî û edebî yên wî çaxî yên Mehabadê hatine weşandin. Ev jî teksta wê helbestê ye ko bû benda yekemîna sûçbarbûn û bidararvekirina Sedrî Qazî:

Ya Xwa be xêr bêy helloy berzefirrî Barzanekem
Remzî pîrozî gel û nîştîmanekem
Bazranî dujminşkên î, şêrî jiyanekem
Pêt le ser çaw û qezat le mall û giyanekem
Bêy to gel û nîştîmanim bê xêw û dîl e
Jêr çepokî dujmin û zerd û mat û zelîl e
Dillî dujmin le tirsî hellmetit dête lerze
Niye dujmin berengarit lem kurey erze
Be to nasra gel û nîştîmanî kurdewarî
Etoy berz û barîz le her laye diyar î
Bêy to ye ke dujmin be ser nîştîmanda zall e
Bêy to gel wek melî zamar û bê perr û ball e
To merdî meydan û neberd û rolley
Warîsî pîrozî îrsî Barzan û tolley
Be mêjû xawen nîştîman û gel û xêw î
Be berzît bazî Barzan û lûtkey kêw î
Lay dujmin barîz û nawbangî be nawan
Be bîstinî dujmin çirkemîze degrê le tawan
Be Barzanim denazim, eqdesî rûy zemîn e
Bêşey şêr û awekey mayey jîn e
Le to fêr bûn be derdî bêbeşan aşnayî
Be to bû şewî bexterrşan rewşenayî
Bê to ye em nîştîmane deken beş beş û dabeş
Bem beş û pirrş û perêşane bû bêbeş
Her to bo nîştîman xemxor û pirr mişûr î
Feramoşit nekird le katî xurbet û dûrî
To bo gel û nîştîman mujde û hem firîştey
Beşarethênerî em herd û şar û deştey
Gelim bê to hetîw û perêşan û werrez bû
Melî bê perr û ball û giriftarî qefes bû
Be to geşawe ruxsarî pirr çirç û çirûkim
Be to rizgar û jiyawe gelî mehtûk û sûkim
Kurd im û lew xake bûme, bew awe jiyawim
Bo azadî gel û rizgarî nîştîmanim nemawim
Min be rût û qûtî û pêxwas û bêkirasî
Le mallî xoma dujmin be serbarim denasî
Meqdemî xêrit laybird xemî zorim le ser şan

Be to sarêj bû tenî pirr zarim û hallî perêşan
Zamî derdî kurdanim pirr jan û le mêj e
Dermanî derdî muzmîn dûr û dirêj e
Serwer Mustefa ye, bo Muhemmed, pîştîwan e û bira ye
Ya reb şûilewer key ew dû çira ye
Ya reb be fezl û feyzî xot û nûrî îman
Muweffeq ke Muhemmed, hem Mustefa ra bi xatirî Qur'an
Fexrî gel Mustefa û Barzan mayey şanazî
Fîdate giyan û ser û mallî Sedrî Qazî
Ewey Barzan wa nenasê bê hoşî bê zeman e
Kerr û gêj û wêj û heywan û nezan e
Ewey nahezî Barzan e, caş û xofiroş e yanî
Gewad bab e, zollekurd e û daykî zanî

Piştî derbazbûna nêzî sê mehan di ser dadgehîkirina qaziyan re, li fermandariya artêşa Îranê grûpek ji bo dubare dadgehîkirina qaziyan ji kesên jêrin hate destnîşankirin:-

1- Kolonel Reza Nîko Zade (Dadger)

2- Kolonel Receb Eta (Serokê Dadgeha Pêdaçûnê)

3- Efser Husên Sulih Co

4- Efser Nebewî, wek parêzer ji qaziyan re hatibû destnîşankirin.

Li vir nûçegihan Kiyomers dinivîsîne: Tevî ko tawanbaran (qaziyan) bi hûrî parastin û retkirina wan sûçan di 114 rûpelan û di rûniştina yekê de dabû dadgeha pêdaçûnê û daxwaza selimandina sûçan jî kiribû, lê belê daxwaza wan ji bo heyama sê mehan li Dadgeha Meydaniya Fermandariya Artêşê hatibû hiştin û çawa jî li Mehabadê hatibû girtin û morkirin, welê bi heman awayî mabû û ti kesek ne amade bû, ne veke û ne jî bixwîne.

Herweha jî dema hatina grûpa dadgehê ji Tehranê ji bo Mehabadê, tenê ev daxwaza xweparastina qaziyan jî bi xwe re neanîn ji bo ko bi kêmanî di dema dubare dadgehîkirina wan de, ji wan re bibêjin ko em vê xweparastinê qebûl jî

nakin. Tevî ko yên sûçdar pir ji nivîsara ji bo xweparastinê û selimandina bêsûçiya xwe amadekiribûn, piştrast bûn jî, lê belê welê diyar bû ko biryara sûçbarkirina wan her li Tehranê hatibû girtin û erêkirin jî.

Di berdewama nivîsa xwe de, Kiyomers dinivîsîne: Grûpa pêdaçûnê û dubare dadgehîkirina qaziyan ji bal fermandariya leşkerî ve hate destnîşankirin û ji Şahê Îranê re jî hatine nasandin. Şahenşa hin şîret û raspêrî dabûn wan ko çê nabe bi ti awayî di dadgehê de ti guman û sawîrên wan hebin û berdewam bi riya bêtelê pêwendiya wan ya bi fermandariya artêşê re hebe.

Em, grûpa diyarkiriya dadgehê di 25\3\1947-ê de, me ji Tehranê ber bi Tewrêzê û ji wir jî ber bi Miyanduwawê û Mehabadê ve da rê, di 28\3\1947-ê de, em gihiştin cihê xwe û şevekê me li padgana Mehabadê bêhna xwe da. Spêdê dadgehê dest pê kir, despêkê Qazî Mihemed anî û dest bi lêpirsîna wî hate kirin û sûçên wî heman ew 12 maddeyên berê bûn yên ko ji bal Dadgeha Leşkeriya Meydanî ve berbirûyî wî hatibûn kirin, Qazî Mihemed jî tinê sê nebin,tevên din bi tundî ret kirin.

Qazî Mihemed dubare ji bo selimandina sûçan, daxwaza belgeyan kir. Di hemû dema xwendina sûçan û xweparastinê de, Qazî Mihemed pir aram û tena bû, pir bi rêz û hêminî bersîva pirsiyaran dida.

Ji ber ko Qazî pir li ser retkirina sûçan radiwestiya, dadger bi ser Qazî de qêriya û pir bi xeyidîn pê re peyivî, Qazî Mihemed jî bi xeyidîn karvedana xwe nîşan da û bi zimanê farsî ji dadger re got: Şuma hem xurdeyê dîgiran ra neşxwar mîkunîd. Ango: Hun jî dîsa heman xwarina xelkê dicûn.

Herweha jî jê re got: Şuma eger dîn nedarîd û xudara hem nemîşnasîd, îman bi hîsab û kîtabê axîret nedarîd, laeqel zerreî cewanmerd başîd!. Ango: Ko ne dînê we hebe û ne jî hun Xwedê binasin û baweriya we ya bi hîsab û kîtaba axîretê jî nebe, qe nebe bila hinekî mirovantiya we hebe.

Jê re got: We ev hemû derew û buxtan çawa ji min re çêkirine?! eger hun rast dibêjin, belgekê bînin!.

Ji ber ev gotin bi farsî sivikahiyeke mezin e, lewra qaziyê dadger pir xeyidî û bi mistan li serê xwe xist û bi farsî ji Qazî Mihemed re got: **Kurdan seg sifet**?!. Ango: Kurdên kûçik sîfet.

Lêbelê xeyidîn û gefên dadger bandorek li Qazî nekir, belkî berevajî, hîn bêtir berbirûyî dadger bû û jê re got: Kûçik û bêşeref û bêrûmet hun in, ko ne ji xwe û ne ji xelkê û ne jî ji qanûnê re sînorekî nabînin, axir hey bêşeref, tu her dikarî biryarekê ko wî bêşerefê din girtiye, pêk bînî, ji vê pê ve ti şaşiyên din ji destê te nayên, min ji zû de û bi singê fereh xwe ji vê yekê re amade kiriye, ko ez bêsûç im û di riya azadiya gelê xwe de tême kuştin, ez vê yekê weke dilovaniyek ji cem Xwedê ji xwe re qebûl dikim, ez bi vê merg û mirina merd şanazî dikim.

Piştî qediyana gotinên xwe, Qazî Mihemed biryar girt ko êdî ti gotinekê neke û bersîva ti pirsiyareke qazî jî nede, sond xwar ko bersîvê nede û got: Ev namerd her çi şaşiyekê dike, bila bike.

Dadger jî ji bo ko Qazî Mihemed hinekî aram bibe û belkî ji biryara xwe jî poşman bibe, dema bêhnvedana dadgehê ragihand û piştî bêhnvedanê pir hewl da ko bersîva pirsiyarên dadger kolonel Nîkozad bide, lê belê Qazî Mihemed got: Niha biryar ew e ko ez bême bidarvekirin, ev jî ji bo wê soz û peymanê ye, ya ko min daye gelê xwe, min biryar girtiye bi gelê xwe re, ji gelê xwe re bijîm û jê re bimirim jî, niha ezê çawa amade bim soz û sondeke ko min xwariye bişkênim, ji ber wê hemû bêşerefiya kolonel ko xwe kiriye dadger, eger kesekî din ji min bipirse, eger na, ez ne amade me bersîva wî bidim.

Dema ko xuya bû Qazî Mihemed ne amade ye bipeyive, grûpa dadgehê di nava xwe de kete şêwirê, neçar ma biryar

girt di dewsa kolonel Nîkozad de, kolonel Receb Etayî ko serokê dadgehê bû, bû dadgerê dadgehê.

Pirsiyar dubare ji ya yekemîn ve dest pê kir, Qazî Mihemed jî tev pirsiyarên ko berê ret kiribûn, dîsa jî ret kirin. Di bersîva wê pirsiyarê de ka çima bê axaftina bi hukûmeta navendî re bondên bazirganiya petrolê bi Rûsya re mor kirine? Qazî Mihemed keniya û got: Kîjan petrol, kîjan bîr û kompanyaya petrolê li ber destê me bûye ji bo ko em bazirganiyê pê bikin?, seyr e!, eger hun dixwazin bi narewayî sûç û tawanan bidin pal me, sûç û tawanên welê ji me re çêkin ko bi kêmanî hinekî beraqil bin. Heye ko hun ava vî çemê di Mehabadê re derbaz bide, bi petrol bihesibînin, bi rastî jî we pir bi nezanî û bêserûberî ev sûç ji me re çêkirine, ko bingehekî ti ji wan jî nîne.

Herweha di bersîva wê pirsiyarê de ko Qazî Mihemed rê daye, yan jî daxwaz kiriye ko biyaniyên mîna Mela Mistefa têkevin axa Îranê, Qazî Mihemed dîsa mîna sê mehan berê bersîva vê pirsiyarê jî da û got: Mela Mistefa li Kurdistanê ne biyanî bû, Kurdistan mala her kurdekî ye, kes wa lê nekiribû ko ew bête vê derê, rewşê wa kiribû ko ew bêt, ango ji beşeke mala xwe hatiye beşeke din ya mala xwe û .... wesselam.

Ca kolonel Etayî yek bi yek dîsa pirsiyar dikirin û Qazî Mihemed jî her wek berê, dubare sûç ret dikirin. Wê demê kolonel Nîkozad ko dadger bû û Qazî Mihemed pir bi tundî li hemberî wî derketibû, mîna mar xwe dixwar, perçek qumaş ko rengê wî sor, spî û kesk bû û çakuç û dasek li ser hatibû nîgarkirin, ji çanteya xwe derxist û ji Qazî Mihemed re got: Ma qey ev ne hemû hukûmet û ala û teşkîlata we ye?!

Kolonel tifî ala kir û xiste bin lingê xwe û pê lê kir!! Qazî Mihemed li hember vî karê kolonel got: Pêşiyê ev qed ne ala Kurdistanê ye, ji ber li ser ala me çakuç û das nîne, ya din jî ev reftara we nîşana kêmaqilî û bêrûmetiya te ye, piştrast bin destê we nagîje ala Kurdistanê ko hun wî bêhurmet bikin, rojek jî tê li ser vî xaniyê ko tê de têm dadgehîkirin, dê ew ala bête hildan û li ser biheje.

Min ala Kurdistanê raspariye Mela Mistefayê Barzanî û li ser milê xwe, ji vî çiyayî ji bo çiyayê han, ji vî bajarî ji bo bajarê han, û ji vî welatî ji bo welatê han dibe, heta rojekê li ser hemû bilindahiyên Kurdistanê tête hildan û diheje, piştrast bin ew roj dê bêt.

Ca kolonel ji Qazî Mihemed daxwaz kir ko tevî pirs ji derveyî rojeva dadgehê ye jî, lê belê eger ko çê bibe ji wan re qala hin xweserî û reftara Mela Mistefa Barzanî bike?! çi wek bawerî û dîtinên wî, û çi jî wek reftar û sinca Barzanî bi xwe, lê belê bê demargirjî.

Qazî Mihemed got: Dev ji Mela Mistefa Barzanî berde, te bi xwe jî got, Mela Mistefa kesekî biyanî ye û ev ji derveyî rojeva dadgehê ye.

Lê belê kolonel dîsa daxwaz jê kir.. Qazî Mihemed got: Eger kobi dirustî ji te re qala Mela Mistefa bikim, heye ko bibêjî alîdarî û evîn û demargirjiya kurdan ez girtime.

Kolonel Eta jê re sond xwar ko ew ji rastgoyiya wî bawer dike. Wî jê re got: Her di vê dadgehê de, ji min re xuya bûye ko her tiştê te gotiye û dibêjî, te ji kûrahiya dilê xwe û bi bawer gotiye.

Ca Qazî Mihemed got: Ez nikarim ji we re qala hemû xweseriyên Barzanî bikim, hun jî qed nikarin Barzanî bi dirustî binasin, eger ko ez jî bêjim, hun qed napejirînin ko dujminê xwe bi van hemû kar û xweseriyên baş û bedew binasin û yekî weha di rêza dujminatiya we de be.

Dadger dawxaz kir ko li gor agahdariyên xwe, Mela Mistefa ji wan re bide nasandin, her tiştê di derbarê wî de dizane, bibêje.

Qazî Mihemed dîsa tekez kir û got: Ne ez û ne jî kesek din nikare Barzanî weke ko çawa heye, ji we re bide nasandin, dixwazim em dev ji vê yekê berdin.

Lê belê dîsa jê xwest ko ji wan re bibêje. Qazî Mihemed jî got: Baş e, lê belê ez bi tenê dikarim di hin hevokan de bêjim, çi zelamînî û keramet û şerafet û mirovantî û egîdî û merdî û sexawet û mêrînî û netirsiya kesên mezinên di dîrokê de heye, tev li cem Mela Mistefa hene, bawerî û rastî û pakî û dilsoziya ji Xwedê û ol û xelkê hejar û damayê gel re, yên di despêka Îslamê de hebûne, ev hemû li cem Barzanî hene, Mîna ko Sadî dibêje: **Her ançê hemê darend, û bê tenha dared**. Ango: Yê ko li cem teva bi hev re heye, hemû bi tinê li cem wî hene. Ca hun dixwazin bawer bikin û bila li we xweş bêt, dixwazin jî bila li we nexweş bêt.

Tevên ko li dadgehê bûn, ji vê pesna Qazî Mihemed hêbetî man. Qazî Mihemed dixuyî ko ev hemû gotin ji kûrahiya dilê xwe û bi bawer digotin û ti sawîr û guman nebûn ko pesna dida Mela Mistefa, ne ji bo xatirê şabûna Mela Mistefa û ne jî ji ber xatirê grûpa dadgehê bû.

Etayî jê pirsî: Ev hemû xeyidîna we ya ji cenabê kolonel Nîkozad çima bû?! ji ber me bihîstiye ko li vî welatî mîna te hêmin, aram û liserxwe nîne?!.

Qazî Mihemed got: Ez wî mafî nadim ti kesî ko sivikahiyê bi gelê min bike, niha ji bona gelê min cezayê bidarvekirinê li min hatiye birîn, niha ez ji bo xatirê çi amade bim sivikahiya her xwêrî û nemerdekî qebûl bikim û min bi tinê bersîva wî daye, ne bêtir, ev karê Xwedê ye ko divê xwêrî û bêserûlingek bêt sivikahiyê bi gelê kurd bike, ne ji hêjayî û lêzaniya wî ye. Ca ez çi dixwazim ko her bêhurmetiyekê qebûl bikim?!, her wek helbestvanê fars Sadî dibêje: **Her an kes dest ez can bişûyed, her ançi der dil dared bigûyed**. Ango: Her kesê ko dev ji canê xwe berde, divê ko her tiştê di dilê wî de ye, bibêje. Eger ko ez ne wek bênezaketî dibînim, hê jî di dilê min de tiştê ko min bigota pir e, niha tiştê ko min ji Xwedê hêvî dikir, Xwedê ew daye min, ango merg û şehîdbûna ji bona ol û gelê xwe û hêvîxwaz im ko ez bi rûkî sor biçim bargehê Xwedayê mezin û dilovan.

Dawiya dadgehîkirinê sûçek din jî da pal Qazî ko xudêgiravî ev malika helbestê: **Hemê serbiser poşt bi duşmen dehîm, ez an bê kê xudra bi kuşten dehîm**. Ango: Em hemû pişta xwe bidin dujmin, ji wê baştir e ko em yekî xwe bidin kuştin. ji hejmareke efser û kadroyên komarê re xwendiye û wan jî kiriye paroleya xwe. Lê belê Qazî Mihemed got: Cara pêşî ye ez vê helbestê dibihîzim.

Piştre dadger bi xwe got: Na na, Sedrî Qazî (Ebulqasim Sedrî Qazî) ev helbest gotiye û Qazî Mihemed helbestek din ji hêza çekdara komara Kurdistanê re gotiye û tê de dibêje: Artêş û hukûmeta Îranê wek malika helbesta: **Pîremerdî zinezh mînalîd, pîrezen sendeliyiş hem mîmalîd**. Ango: Kalek ji kul û derdê xwe dinaliya, pîreka wî jî kursiya wî dimalî.

Efser Kiyomers Salih piştî karkinarbûnê, di jêrnivîsa kovareke din de dinivîsîne: Dema ko ez nûçegihanê Mehnameya artêşê bûm, ez wek nûçegihan tevlî piraniya dadgehên meydanî û leşkerî û bedewî bû me, lê belê min qed ti carî kesekî bi qasî Qazî Mihemed bi cerg û wêrek nediye, di dema dadgehîkirinê de qed netirsiya bû û pir bi bêminetî dipeyivî û bersîva pirsiyaran dida, weke ko di rêwresmên cejn û şahiyekê de rûniştibe, welê bû.

Her di derbarê dadgehîkirina cara duyemîn ya Qazî Mihemed de, Kiyomers Salih di Mahnameya xwe de dinivîsîne ko wî hemû serpêhatî û bûyerên dadgehîkirinê, wek ko çawa bûne nivîsandine û welê diyar e her bi sedema vê yekê jî bû, dawiyê bi sûça eşkerekirina nepeniyên leşkerî û dijî ewlekariyê, (Mehname)-ya wî nehatiye belavkirin û efser Kiyomers jî daye dadgehê.

Efser Kiyomers herweha jî berdeam dibe û dinivîsîne: Dema ko kolonel Nîkozad sivikahî bi Qazî Mihemed û gelê kurd kir û Qazî Mihemed jî pir bi tundî bersîva wî da, Qazî Mihemed got: Pêşiyên me, pir ji me baştir hun dinasîbûn, Xwedê li wî helbestvanî xweş bibe yê ko dibêje: ....

Efser Kiyomers Salih dibêje: Helbestek pir bi mane û bilind û germ bû, ko bi farsî xwend û rih û rîşalên ecem û şîeyan derdixist. Min dixwest wê helbestê binivîsînim û bizanibim ka helbesta kê ye, lê belê dem dema dadgehîkirinê bû, min nedikaribû dîsa helbestê pê bidim dubarekirin. Qazî Mihemed piştî xwendina helbestê got: Hun weha nîşanî me dane û ji me re nasandine, hezar rehmet li wan bin.

Kolonel Eta dîsa ji Qazî pirsiyar kir: Ji dema ko Mela Mistefa ji vê derê çûye, çi pêwendiyên we pê re hebûne, eger hebûne, kîjan rojê û çawa bûye?.

Qazî Mihemed got: Heta Barzanî gihiştibû derdorên Şino û Nexedê jî, pêwendiyên me bi hev re hebûn, lê belê ji dema ko ew dûr ketiye, ti pêwendiyên me nemane û haya mın jê nîne.

Dîsa jê pirsî: Erê hun dikarin bibêjin ka dema pêwendiya we bi Mela Mistefa re hebû, Mela Mistefa çi raspariye we? çi nexşeyên wî yên ji bo rizgarkirina te hebûn?!

Di bersîvê de Qazî Mihemed got: Mela Mistefa Barzanî pir hewl da ko ez pê re biçim, heta hê neketibûm girtîgehê, ji min re got ko ez dilê xwe bi bêsûçiya xwe xweş nekim. Mela Mistefa wêneyê rastîneyê we eceman ji min re kişand û ez têgihandim ka hun çawa û çi û kî ne!.

Kolonel Eta jê pirsî: Hun dikarin ji me re bêjin ka wêneyê me yê wî ji te re kişandibû, çi û çawa bû?

Qazî Mihemed got: Bi rastî jî wî ji her kesî baştir hun nasîne. Mela Mistefa ji min re got ko ti gel û milet ne wek eceman in, dema ko desthilata eceman hebe, kesên ji wan bêdilovanî, bêwijdan û zalimtir nîne, lê belê eger bindest bûn, kes wek wan nikare xwe mezlûm bike û bikeve hêvîkirinê, di dema hêzê de her çi yê ji destê wan tê dikin, di dema bê desthilatiyê de jî bi her çi awayî rizgar bibin, dikin û dibêjin, ca tu li benda wê yekê nemîne ko te ti sûç nekirine û ecem dê li te biborin.

Dîsan kolonel Eta jê pirsî: Tu ne poşman î ko tu pê re neçû yî?!.

Qazî Mihemed bersîv da û got: Eger ko Xwedayê mezin vî awayê mirina min weke xwehîlakkirin qebûl neke, na ez ne poşman im, ji ber min soz dabû gelê kurd ko ez bi wan re bijîm û ji bona wan bimirim. Min dizanîbû eger ko ez biçûma û neketama destê we, piştrast im we dê pir kes ji xelkê Mehabadê û gelê kurd ji tolhildana min bikuşta, ca lewra yekem, şam e ko ez bêsûç tême kuştin, û duyem jî, li soza xwe xwedî derketim û hêvîxwaz im rûsorê dinya û qiyametê û yê cem Xwedê û gelê xwe bim.

Pirsiyar: Erê dema ko tu di girtîgehê de bû yî, ti nexşe û plan, yan tiştên din yên Barzanî yên li derveyî Mehabdê ji bo rizgarkirina te hebûn?.

Qazî Mihemed got: Belê, Barzanî xeber da min ko her şeveke ez bibêjim, ew dikare hejmareke mezin ya pêşmergeyên xwe bişîne û têkevin padganê û bi her awayî be min ji girtîgehê rizgar bikin, Mela Mistefa pir dixwest ko ez li girtîgehê nemînim û neyêm kuştin.

Pirsiyar: Lê wî çima ev yek nekir?

Bersîv: Min bi xwe nexwest!

Pirsiyar: Çima, tu çima ne amade bû yî rizgar bibî?!

Qazî Mihemed bersîv da: Ji ber hin sedeman.

Kolonel Etayî pirsiyar kir: Sedem çi bûn?

Qazî Mihemed got: Di serî de, ji ber wan soz û peymanan bû yên ko min gotin, duyem jî ji bo wê yekê bû ko xwîna bêtir neyête rêtin, bi taybetî ji bona mana min, ez bêtir perîşanê kuşt û kuştarê bûm.

Kolonel Eta got: Bi rastî jî tu perîşanê xwe, yan barzaniyan, yan jî tu perîşanê serbazên me bû yî?!

Qazî Mihemed got: Na wella ez ne perîşanê xwe û ne jî yê serbazên we bûm, belkî ez perîşanê kurdan û xortên

barzaniyan bûm, eger na, min ev yek ji xwe re daniye û min dizanîbû ezê her bême kuştin û ev hêviya min e jî.

Kolonel Etayî: Tu dikarî ji me re bêjî ka çima ev qas perêşanê barzaniyan î?!

Qazî Mihemed: Ji ber hin sedeman!!

Kolonel Eta: Ew sedem çi ne?!

Qazî Mihemed: Ji ber Mela Mistefa û barzanî hêviya paşeroja gelê kurd in û min jî ala Kurdistanê raspariye wan, ewê vê alayê biparêzin, heta roja wî têt, ala Kurdistanê li cem wan e, ne yê ko kolonel Nîkozad tif lê kir û xiste bin lingê xwe, hêviya min ji Xwedê ew e ko rojek bêt ew ala bi destê bikare û bihêzê Barzanî li ser vî xaniyê ko niha ez tê de têm dadgehîkirin, û herweha jî li tev bilındahiyên Kurdistanê bête hildan.

Kolonel Eta: Pirsiyara dawî, erê bi rastî jî tu bi xwe neçûyî, yan Mela Mistefa tu bi xwe re nebirî û nedixwest tu bi wî re biçî?!

Qazî Mihemed: Welê diyar e hun ji gotinên ez dibêjim bawer nakin?!

Kolonel Eta: Na, dixwazim tu ji min re rastiyê bibêjî?1

Qazî Mihemed: Ji te re dibêjim, tu jî sivikahiyê nekî, yanî çi rastiyê ji te re bibêjim, ev tê çi maneyê?!.. na, ezê kû ve biçim, vira axa Kurdistanê ye, bav û kalên min li vira jiya ne, xwe ne ez Pîşewerî yê jinsîfet im ko welat û gelê xwe bihêlim û bireviyêm?!..

Kolonel Eta, ji tirsa ne wek ko Qazî Mihemed dubare bixeyide û mîna Nîkozad wî jî riswa bike, zû daxwaza lêborînê kir û sond xwar ko niyaza wî ne sivikahîkirin bû, lê belê axaftinek bû û hate gotin.

Qazî Mihemed: Eger ko min axaftinek gotibe û li we xweş hatibe, mebesta min ne ew bûye ko dilê we xweş bikim, min bi tinê rastî gotiye.

Kolonel Eta: Bi rastî jî ez dixwazim tu bersîva vê pirsiyara min bidî, ko tu ev qas hogirê gel û welatê xwe yî, çima û çawa bû te rê da biyaniyan têkevin vî welatî û bibin serbazên gelê te?!

Qazî Mihemed: Hun ev qas vê gotinê dubare dikin, welê diyar e merema we hêzên rûs û îngilîzan e?

Serheg Eta: Na, merema min Mela Mistefa Barzanî ye!

Qazî Mihemed bi ken got: Demek e min bersîva vê pirsiyara we daye, dubarekirina wê ne gerek e, min ji we re got ko ne min û ne jî biyaniyan û ne jî kurdan, Barzanî ne aniye, Mela Mistefa kurd e û Kurdistan mala her kurdekî ye. Mela Mistefa weke mirovek ji beşeke mala xwe, hatiye beşeke din, mafê her kesî jî heye ko li her cih û kuncekê milk û mala xwe bijî û ev mafê wî ye, baş baş bizanin min bi xwe nexwest biçim, eger na çendîn otomobîl li ber destê min bûn, her dema ko min bixwesta, min dikaribû ji axa Îranê derkevim, min pir jî baş encama vî karê xwe dizanî, min hun pir baş dinasîn, her weke ko Barzanî jî digot, di dema zelîliyê de, kes nikare mîna we bikeve hêvîkirinê û mezlûmiyeta xwe nîşan bide, lê belê di dema desthilatdariyê de, ti kesên ji eceman zalimtir û bêdilovanîtir û serhişktir û dilreştir nî ne.

Bi vî awayî dadgehîkirina Qazî Mihemed qediya. Ca dora Mihemed Husên Xanê Seyfî Qazî hat û pir bi heybet û aram û bi wêrekî teke hundir û te digot qey ev ne dadgeh e jî. Kolonel Nîkozad dîsa kete cihê xwe yê fermî û rûyê xwe da Seyfî Qazî û dest bi pirsiyran kir:

Pirsiyar: Tu çawa bûye wezîrê ceng û te çima ev berpirsiyariya pembeyî wergirt û merema te ji vî karî çi bû?!

Seyfî Qazî: Min bi şanazî ev erk wergirt û merema min xizmeta gelê min bû û tiştek din na.

Nîkozad: Merema te xizmet bû, yan jî te dixwest bi riya berpirsiyariyê diravan bidî hev û pê bijî?

Seyfî Qazî bi ken: Kolonel, meger tu bi xwe jî min nanasî, ji bilî ko min ev yek ji bona diravan nekiriye, min bi qasî 2

milyon tumenan jî ji gel û komara Kurdistanê re mezaxtiye ko dirav û malê min yê taybetî û kesane bû. Kolonel welê diyar e ji bilî ko tu tiştekî di derbarê min de nizanî, tu herweha tiştekî ew qas di derbarê sinq û tîtalên dadgehê de jî nizanî!

Li vir, ji ber kolonel hê jî ji gotinên Qazî Mihemed xeyidî û dilpir bû û hest bi şkestin û dorandinê dikir, dixwest behanan ji Seyfî Qazî re derxe û xwe bixeyidîne, lê belê Seyfî Qazî hoşdarî dayê û jê re got: Me êdî dev ji jiyan û mala xwe berda ye û eger tu yek misqal bêedebî û cesaretê bikî, ez ne wek Qazî me ko her bi gotin û sixêfan dev ji te berdim.

Mista xwe kire girê û nîşanî kolonel da û got: Ezê bi vê mistê, ser û guh û dev û diranên te bişkênim, ma qey ji mirinê pê ve ko hêviya me ye, tiştek din heye?! we ji me re milyonek derew û buxtan û gotinên kirêt û tiştên din, tiştên din yên bêmane çêkirine, ca hun dixwazin ko şaşî û namaqûliyên bêtir jî bikin!. Ti bingehekî derew û buxtanên ko we ji me re çêkirine nîne, lê belê ez li vir didim xuyakirin ko ez wan hemû derew û buxtanan bi şanazî li ser xwe qebûl dikim û êdî ez ne amade me bersîva we bidim.

Bi vî awayî dawî li dadgeha Seyfî Qazî jî hat. Ca dor giha Ebulqasim Sedrî Qazî û ew jî anî ber dadger û yekem pirsiyara ko li wî kir ew bû: Erê merema we ji wê nameyê çi bû ya ko we ji Qazî Mihemed re nivîsandibû û daxwaz kiribû ko heta alîkarî digîje wan, xwe bigirin?!.

Sedrî Qazî got: Qed tiştek welê çênebûye û ger welê ye, kerem bikin nîşan bidin!.

Ca dadger got: Ew çi helbest e te ji Barzanî re nivîsandiye?

Sedrî Qazî got: Belê min helbest nivîsandiye, min ji Barzanî hez kiriye û min jê re helbest nivîsandiye.

Dadger dubare jê pirsî: Erê alîkariya te gotibû, berê jî hatibû kirin, yan ev cara yekemîn bû ko ji bal biyaniyan ve alîkarî bi we re bihata kirin?!!

Sedrî Qazî dîsa jî got: Ez ret dikim ko tiştekî weha çê nebûye.

Dadger got: Hun çima li Tewrêzê bi Pîşewerî re civiyan û we gotûbêj bi Nemaz Elîyof yê fermandarê leşkerî yê rûsî li Miyanuwawê re kiriye û hatinçûyîna Alxander li Meraxê û kunsulê Rûsya li Ormiyê kiriye û we bi wan re rûniştin û civîn çê kirine?!

Ebulqasim got: Ev pêwîstiyên rojê bûn.

Dadger got: Ev kar sîxuriya ji rûsan re bû.

Lê belê Ebulqasim Sedrî Qazî ev dîtina wî ret kir û got: Sîxurî ji kê re, çima çi li welatê me heye ko weke çawa heye rûsan nedîtibe, tiştek, cihek heye ko rûs bi xwe neçûbin wir.

Ca dadger navê hin nameyên din jî anî ko xudêgiravî wî weha û weha nivîsandine. Ebulqasim got: Min her tiştek ji her cihekî re nivîsandibe, min kopiyeke wê li cem xwe hiştiye, hêvî ye dosyaya me bişînin Tehranê, name û belgenameyên min tev li wir in, dê baştir zelal bibe ka min çi û ji kê re nivîsandiye.

Bi vî awayî dubare dadgehîkirina hersê qaziyan jî qediya, desteka dadgehê dubare kete giftûgo û gengeşê, bervajî dadgehîkirina din ya meydanî, ko di kêmtirî nîv seetê de dawî li şêwira xwe anî bû, û biryara xwe girtibû, vê carê biyargirtina grûpa dubare dadgehîkirinê bêtirî 10 seetan berdewam bû, di wê heyamê de pêwendiya bêtelê di nêvbera Mehabadê û Tehranê de berdewam bû, heta seet 12-ê nîva şevê biryar girt û cezayê bidarvekirinê li hersê qaziyan birî û pir bi lez jî ev biryar gihande Tehranê. Ti kesî ji Qazî Mihemed û Sedr û Seyfî Qazî û ji me jî, me ji biryara Tehranê fêm nedikir, lê belê dema ko me didît reng û sîmayê fermandarê leşkerî pir hatiye guhertin û destên wî dilerizin û bi lez bi bêtelê mijûlî pêwendîkirina bi Tehranê re ye, em pê hesiyan ko biryara herî giran di derheqa wan de hatiye girtin.

Biryar welê bû ko wê şevê bi tinê nîv seetê pêwendiya bêtelê bi Tehranê re hebe, lê belê wê şevê welê diyar bû ko fermandariya arteşê û Derbara Şah jî heta berê sibê li benda encama dawiyê ya dadgehê mabûn.

Ya rast ew e ko dadgeha pêdaçûnê jî heman sûçên dadgeha meydaniya berê dubare kirin û ji bo sûçan jî belgeyên pêwîst ne anîn, ti girîngî jî neda retkirina tawanbaran (qaziyan) û biryara bidarvekirina hersêyan jî pejirand.

Êdî kar hate kirin ji bo ko cihekî nava bajar bibînin da ko li wir darê sêdarê hilêxin, welê diyar bû fermandarê leşkerî zûtir, beriya biryara dadegehê bête girtin jî, rojek berê xaniyê ko li Çwarçira ye û hin qatên wî hene, destnîşan kiribû, ango her ji serî de cihê bidarvekirinê ji wan re destnîşan kiribû, fermandar got: Me cihê pêwîst amade kiriye.

Di nava otomobîlan de, li benda destûra birêketinê bûn, lê belê ji Tehranê biryar hatibû girtin ko xudêgiravî ji bo tirsandina xelkê kurd û ji bo ko pend û îbretan jê bigirin, li meydana Çwarçira ya nîva bajarê Mehabadê bêne bidarvekirin. Fermandarê Mehabadê di dema hatina grûpa dadgehê de ji bo Mehabadê, xaniyê ko li meydana Çwarçira bû, ji rûniştvanên wê vala kiribû, xaniyê ko sê qatên wî hebûn, hersê qatên wî bi behaneya ko bi şev dê efserên çavdêriya bajar lê bimînin ji rûniştvanan vala kiribûn, sê deriyên xanî hebûn ko yek ji meydanê re û yê din ji derveyî meydanê re dihate vekirin û yê sêyê jî ji hewşeke piçûk ya xanî re vedibû.

Destûra birina Qazî Mihemed ya ber bi meydanê ve hate dayîn, dema ko otomobîl gihişte ber deriyê xaniyê li meydana Çwarçira, Qazî Mihemed pirsiyar kir: Çima divê ez li vir peya bibim?!

Yê efser jê re got: Rêwîtiya te dê ji vir ber bi Tehranê ve bête organîzekirin û hin pirsiyar mane ko dê li vir li te bêne kirin.

Qazî Mihemed ji otomomobîlê daket, dema ko kete nav wê qerebalixiyê, dît ko dadger kolonel Nîkozad û melayekî kurdewarî û hin serbazên çekdar di odeyê de ne, herweha maseke mezin û Qur'anek jî li ser maseyê heye, û serokê tendirustiyê ko nû ji Tehranê hatibû Mehabdê, tev li wir in. Di

wê odeyê û di cih de Qazî zanibû ko çûyîna wan ya Tehranê derew e û ew bi xapandin aniye Çwarçirayê.

Dadger Nîkozad dest bi xwendina cezayê dadgehê kir û ew têgihand ko her niha divê ev ceza pêk bêt. Ji Qazî Mihemed re got: Eger ko wesyeteke te heye, bibêje yan jî binivîsîne. Qazî Mihemed pir bi gurcî û çelengî cihê xwe yê li pişt maseyê girt û dest bi nivîsandina wesyetnamê kir, heta çend rûpel nivîsand, piştre welê dixuyî ko westiya ye, lewra ji meleyê Mehabadî re got: Were ya ez dibêjim, tu binivîsîne.

Qazî Mihemed pir bi zelalî digot û pê dida nivîsandin. Got: Binivîsîne bila filan erd û filan cih û filan der... ji bo mizgeftê û dibistanê û nexoşaxanê be, da ko ji bo ji gelê kurd, nivşên paşerojê mifa jê bigirin. Şîretên yekbûn û bihevrejiyanê û evînê li kurdan kir. Dema ko dawî li wesyetnameya wî hat, dest bi xwendina nimêjê kir. Ji xwedê tobe û hêvî dixwest. Vê yekê nêzî du seet û nîvan dem derbaz kir, dadger ji derbazbûna vê hemû dema dûr û dirîj xeyidî, ew ji bo vegera Tehranê bi lez bû.

Piştî ko Qazî Mihemed wesyetnameya xwe nivîsand û nimêj û hêvîkirina ji Xwedê qedand, daxwaz kir ko rê bidin wesyet û şîretan ji xelkê kurd re binivîsîne. Dadger rê dayê. Dawxaza xame û kaxezan kir, jê re anî, her ji bo ko dadger kolonel Nîkozad û tevên li wir jî bibihîzin û fêm bikin, ji mele re got: Were binivîsîne, ez çi ji te re dibêjim, tu her wê binivîsîne.

Mele got: Qurban ez çi binivîsînim?, bila ez bizanim ka tiştê tu dixwazî binivîsînim, dê dadger riyê bide te?!.

Qazî Miheemd xeyidî û got: Dadger kî ye ko rê bide, yan nede min ka ez dixwazim çi bêjim?!.

Li vir Kiyomers Salih dinivîsîne: Qazî Mihemed ew tişt bi farsî digotin û ji mele re digot, tu bi kurdî binivîsîne.

Mele got: Qurban ez nizanim bi kurdî binivîsînim.

Qazî Mihemed xeyidî got: Ev jî yeke din ji bextreşiyên gelê kurd e.

Di berdewama vê mijarê de Kiyomers Salih dinivîsîne: Ca Qazî Mihemed dubare bi xwe dest bi nivîsandina wesyetnameya xwe kir û bi awayê li jêr û bi destxetekî pir bedew nivîsand:

Bi navê Xwedayê mezin û dilovan.

Gelê min yê kur û birayên min yên hêja, birayên min yên parxwarî, gelê min yê zorlêkirî, va me ez di gavên herî dawî yên jiyana xwe de me, werin ji bo xatirê Xwedê êdî dujminatiya hev mekin û pişta hev bigirin, li hember dujminê zordest û zalim derkevin, xwe belaş mefiroşin dujminan, dujmin her ew qas we dixwaze heta karê xwe bi we pêk tîne û qed bi we re dilovanî nake, di her derfetekê de be, qed li we nabore.

Dujminên gelê kurd pir in, zordest û bêdilovanî ne, sembola serketina her gel û netewekê, hevgirtin û yekbûn e, piştgiya tev gel e. Her gelê ko yekîtî û tebayiya wî nebe, ewê hertim di bin destê dujmin de bimîne, ti tiştê we gelê kurd ji gelên li ser rûyê vê erdê ne kêmtir e, belkî hun bi mêranî û egîdî û hêjatiya xwe, ji gelên ko rizgar bûne, li pêştir in jî. Gelên ko ji destê dujminên xwe yên zordest rizgar bûne, mîna we ne, lê belê yekîtiya yên xwe rizgar kiriye hebûye, bila hun jî mîna tev gelên li ser rûyê erdê, êdî bindest nebin, her bi yekbûn û hesûdî bi hev nebirinê û xwe nefirotina ji dujminan re, li dijî neteweya me, hun dikarin rizgar bibin.

Birayên min, êdî bi dujminan meyên mexapin, dujminên kurdan ji her reng û grûp û netewekê bin, her dujmin in, bêdiolavanî ne, bê wijdan in û rehmê bi we nakin, dê we bi hevdu bidin kuştin, dê we temah bikin û bi derew û xapan, dê we berengarî hev bikin.

ji dujminên gelê kurd tevan, dujminê ecem ji tevan zalimtir û mel'ûntir û Xwedênenastir û bêdilovanîtir e, destê xwe ji ti tawanan li dijî gelê kurd naparêze, bi dirêjahiya dîrokê bi gelê kurd re xerez û kîna wî ya kevnar heybûye û heye jî. Temaşa bikin, binêrin tev zilamên we yên mezin, her ji Simayîl Axayê Şikak, heta Cewher Axayê birayê wî û Hemze Axayê Mengur

û çend û çendîn zilamên din, ew hemû bi xapan aram kirin û xelk ji pişt wan vekir, ca pir bi nemerdî ew kuştin.

Ew tev bi sond û Qur'anê xapandin ko xudêgiravî niyaza eceman ya xêrê bi wan re heye û dê qenciyê bi wan re bikin, lê belê her xweşbawer e û bi sond û sozên eceman hatiye xapandin û jê bawer kiriye. Heta niha bi dirêjiya dîrokê kes nedîtiye bi tinê carekê jî ecem li sond û sozên xwe xwedî derketibin û ehdên dane kurdan pêk bînin, hemû derew û xap bûn. Ca va ye ez wek birayekî we yê piçûk, di riya Xwedê de, ji bo xatirê Xwedê ji we re dibêjim, hev bigirin û ti carî pişta hev ber medin, piştrast bin eger ko ecem hingiv bide we, diyar e jar xistiyê. Bi sond û sozên derewên eceman mexapin. Eger ko hezar carî jî dest li Qur'ana pîroz bixin û soz jî bidin we, bi tinê niyaza wan xapandina we ye, ji bo ko hîlekî li we bikin.

Va me ez di demên dawî yên jiyana xwe de me, ji we re dibêjim û ji bo xatirê Xwedayê mezin, ez we şîret dikim ko ya ji destê min hat, bi ser û can û tekoşîn, bi şîret û nîşandana riya rast, min ji we re xemsarî nekiriye, niha jî di vê dem û rewşê de, dîsa ji we re dibêjim ko êdî bi eceman mexapin û ji sond û destlêxistina wan ya li Qur'anê û ehd û peymanên wan bawer mekin, ji ber ko ne Xwedê dinasin û ne jî ji Xwedê û pêxember û roja qiyametê û hîsab û kîtaban bawer dikin.

Li cem wan bi tinê ji ber ko hun kurd in, bila hun misilman jî bin, hun sûçdar û mehkûm in, hun ji wan re dujmin in, ser û mal û canê we ji wan re helal e û weke xeza qebûl dikin. Soza min ne ew bû ko ez biçim û we di destê van dujminên dilreş de bihêlim, min pir caran jî rabori û zilamên me yên mezin dihizirandin, zilamên me yên ko eceman bi xap û sond û derew û hîleyan ew girtine û kuştine, neçar bi derew û hîle ew xapandine, kuştine. Ew tev li bîra min bûn û ti carî jî min ji eceman bawer nekiriye, lê belê beriya ko vegerin vir, çendîn caran gotin û raspêrî bi name û bi şandina kesên navdêrên kurd û fars, bi dayîna soz û ehdên yekcar zêde û mezin ko niyaza xêrê ya dewleta ecem û Şah bi xwe jî heye û ne amade ne ko bi tinê dilopeke xwînê jî li Kurdistanê birije,

niha hun bi çavê serê xwe encama sozên wan dibînin, ger mezinên hoz û eşîrên me îxanet nekira û xwe nefirotina hukûmeta ecem, weha nedihate serê me û we, û komara me jî.

Şîret û wesyeta min ew e, bila zarokên we bixwînin, ji ber ti tiştê me ji yê gelên din ne kêmtir e, bi tinê xwendin nebe, bixwînin ji bo ko hun ji karwanê gelan paş ve nemînin û her xwendin çeka kujeka dujminan e. Piştrast bin û bizanin eger ko tebayî û yekbûn û xwendina we baş be, hunê pir baş bi ser dujminê xwe de serbikevin jî. Çê nabe bi kuştina min û bi kuştina bira û pismamên min, çavê we bitirse, heta hun digîjin hêvî û armancên xwe, divê hun hê jî pir kesên din yên mîna me, di vê riyê de gorî bikin.

Piştrast im piştî me pir kesên din jî her dê bi xap û durûtiyê ji holê bêne rakirin. Piştrast im pir kesên ko dê piştî me jî bikevin xapên eceman, dê ji me zanatir û hêjatir jî bin, lê belê hêvîdar im kuştina me ji dilsozên gelê kurd re bibe pend û îbret.

Wesyeteke din ya min ji we re ew e, daxwaz bikin her çiyê we ji bona serfiraziya gel kir, alîkarê we gel be, piştrast im Xwedayê mezin dê we bi ser xîne û dê alîkariya we bike. Heye ko hun bibêjin: Lê çima ez serneketim?! di bersîvê de dibêjim: Bi Xwedê kim, ez serketî me, çi nîmetek, çi serketinek ji wê yekê mezintir e ko va me ez niha di riya gel û welatê xwe de, ser û mal û canê xwe didim, bawer bikin min pir ji dil dixwest eger ko ez mirim bi mirinekê bimirim ko di hizûra Xwedê û resûlê Xwedê û gel û welatê xwe de, rûsor bim, ji min re ev serketin e.

Xweştiviyên min, Kurdistan mala her kurdekî ye, her wek di malê de, endamên malê her kesê ji her karekî dizane, wî karî dispêrin wî, êdî mafê ti kesî nîne ko hesûdiyê pê bibe, Kurdistan jî her ew mal e, eger ko we zanî kesek li vê malê dikare karekî bike, dev jê berdin bila bike. Êdî çê nabe hun kevran derxin ser riya wî û çê nabe dilê we ji wê yekê biêşe ko berpirsiyariyên mezin di destê yekî ji we de hene, eger ko

karên mezin ketin ser milê yekî û ew kar bi rê ve bir, welê diyar e jê dizane û berpirsiyariyên wî yên mezin jî li hember wê erkê hene. Piştrast be birayê te yê kurd her ji dujminê dilbikîn baştir e û eger ko berpirsiyariyên mezin li ser milê min nebûna, niha ez di bin darê sêdarê de nedirawestiyam, lewra jî çê nabe hun bi hev re temahkar bin.

Yên ko fermanên me pêk neanîn, ne her bi tinê pêkneanîna fermanan, lê belê tam dujminatiya me dikir, ji ber ko me xwe wek xizmetkarê gelê xwe qebûl dikir, niha ew di nava mal û zarokên xwe de, di nava xewa şirîn de ne, lê belê va ye li ser navê xizmeta gel, di bin darê sêdarê de me û va ez demên dawî yên jiyana xwe bi vê wesyetnamê derbaz dikim. Ca eger ko berpirsiyariyên mezin di stoyê min de nebûna, ez jî dê niha di nava zarok û zêçiyên xwe de, di xewa şirîn de bûma. Ko ez niha ji bo piştî çûyîna xwe jî, we şîret dikim, ew jî yek ji berpirsiyariyên di stoyê min de ye. Piştrast im eger ko yekî din ji we jî berpirsiyariyên min bigirtana ser milê xwe, niha ewê li şûna min di bin darê sêdarê de bûya.

Ji bo razîbûna Xwedê û li gor berpirsiyariya di stoyê xwe de, mîna kurdekî xizmetkarê gel û di riya çakiyê de, min ev şîret li we kirin, ko hêvîdar im ji niha û pê ve pendan jê wergirin û dirust guhdariya şîretên min bikin. Bi hêviya ko Xwedayê mezin we bi ser dujminên we de, bi ser xîne:-

1. Baweriya we bi Xwedê û tiştê ji cem Xwedê têt û peristina Xwedê û pêxember (Silavên Xwedê lê bin) hebe, di pêkanîna erkên olî de xurt bin.

2. Yekîtî û tebayiya di nava xwe de biparêzin, karê neqenc li hember hev mekin û temah mebin, bi taybetî jî di berpirsiyariyê û xizmetê de.

3. Xwendin û zanist û pileya zaniyariya xwe pêş ve bibin, ji bo dujmin kêmtir we bixapîne.

4. Ji dujminan bawer mekin, bi taybetî jî dujminên ecem, ji ber ko bi çend awa û riyan ecem dujminên we ne, dujminên gel û welat û ola we ne. Dîrokê selimandiye ko berdewam li

kurdan bi behane ne, bi kêmtirîn tawanê we dikujin û ji ti tawanan jî di derheq kurdan de, destê xwe nagirin.

5. Ji bo hin rojên jiyana bêqîmeta vê dinê, xwe mefiroşin dujminan, ji ber dujmin dujmin e û ne cihê pêbawerbûnê ye.

6. Îxanetê li hev mekin, ne îxaneta siyasî û ne giyanî û malî û ne jî ya namûsî, ji ber îxanetkar li cem Xwedê û mirovan jî sivik û sûçbar e, îxanet li yê îxanetkar vedigere.

7. Eger ko yekî ji we dikaribû karên xwe bê îxanet pêk bîne, pê re alîkarî bikin, ne ji ber temahî û bexîliyê li dijî wî derbikevin, yan Xwedê neke li ser wî bibin sîxurên biyaniyan.

8. Cihên ko min di wesyetnameyê de ji mizgeft û nexoşxane û dibistanan re nivîsandiye, hun tev daxwaz bikin da ko pêk bên û mifa jê bigirin.

9. Hun ji xebat û hewl û tekoşînê ramewestin, ji bo ko mîna tev gelên din ji bin destê dujminan rizagr bibin. Malê dinê ne tiştik e, eger ko welatê we hebe, serbestiya we hebe, wî çaxî her tiştê we heye, hem mal, hem serwet, hem dewlet, hem rûmet û hem jî dê nîştimanê we jî hebe.

10. Ez bawer nakim, heqê Xwedê nebe, ti heqên din yên ti kesî li ser min hebin, lê belê eger ko kesekî welê dît ko kêm yan jî zêde tiştikî wî li cem min e, min malekî pir li pişt xwe hiştiye, bila biçe ji warisên min bixwaze û bistîne.

Heta ko hun hev negirin, hunê sernekevin, zilm û zorê li hev mekin, ji ber ko Xwedê pir zû zaliman ji holê radike û nabûd dike. Ev soza Xwedê ya bê kêm û zêde ye, zalim dirûxiyê û nabûd dibe, Xwedê toleya zilmê jî hil dide. Hêvîxwaz im van gotinan têxin guhê xwe û Xwedê we bi ser dujminên we de bi ser bixe, weke Sadî kerem kiriye: **Muradê ma nesîhet bûd û gufîtm, hewalet ba Xuda kerdîm û reftîm**. Ango, mirada me şîret bûn û me kir, me hun rasparin Xwedê û em çûn.

Xizmetkarê gel û welat

Qazî Mihemed

Piştî ko Qazî Mihemed dawî li nivîsandina wesyetnameyê anî, ji dadger re got: Dixwazî ji te re bixwînim?!

Dadger got: Ne hewce ye.

Qazî Mihemed got: Baş e, lê belê ji ber di şer'ê îslamê de bidarvekirin napesend e, ko hunê min bikujin, min gullebaran bikin. Lê belê dadger ev daxwaza wî qebûl nekir, ji ber biryara dadgehê xeniqandina bi werîsî bû.

Ca Qazî Mihemed got: Ezê nimêjê bixwînim û destûratên beriya mirinê bikim. Rê dayê .. beriya biçe ber werîsê sêdarê, rûyê xwe da Qîbleyê û herdu destên xwe bilind kirin û ji Xwedê hêvî kir û bi dengekî bilind got: Xwedêwo, tu şahid î ko min ji bo xizmeta gel ti xemsarî û kêmanî nekiriye. Xwedêwo, tu şahid î ko her tiştê ji destê min hatibe, min di riya te de û ji bo razîkirina te kiriye. Xwedêwo, ji bo xatirê xwe, toleya mezlûman li dinê û li axîretê jî ji zaliman hilde, ko dizinim her welê ye jî. Ey Xwedayê ko haya te ji her tiştî heye, tev gelên bindest û gelê kurd jî, ji bin destê van zaliman rizgar bike.

Piştre Kiyomers dibêje: Ev rêwresm û hêvîkirinên ji Xwedê, nêzî bîst deqîqeyan berdewam bûn, herweha peyvên ko Qazî Mihemed bi kurdî digot, min wateya wan ya bi farsî ji meleyê kurdê ko li wir bû, dipirsî.

Piştî van rêwresman, Qazî Mihemed bir ber werîsê sêdarê û bi dar ve kir. Bêtirî du deqîqeyan dirêj nekir ko Qazî Mihemed canê xwe da. Seet jî bûbû çarî piştî nîva şevê.

Ca îşaretî kamyona ko Mihemed Hisên Seyfî Qazî yê wezîrê ceng yê komara Kurdistan tê de bû kir, da ko ew jî bête meydanê. Seyfî jî anîn wê odeyê, dema ko dadger û mele û serokê tendirustiyê dît, di cih de zanibû ko karesat çi ye, lê belê qet aloz nebû û nehate guhertin.

Dadger cezayê dadgehê xwend, jê re got ko ew dikare wesyetnameya xwe binivîsîne, wî jî cihê xwe yê li pişt maseyê girt û hemû wesyetnameya xwe di deh rûpelan de nivîsand, heta wê demê jî, nêzîk bû berbeyan dihat. Gava ko

ew ber bi meydanê ve bir, bi zimanê kurdî dest bi hildana paroleyên şoreşgerî kir û bi mist û lingên xwe kete lêxistina ser û guhên efser û serbazan. Li her serbazê dixist, radixist erdê, qêriyên Seyfî Qazî, mîna qêriyên şêr bûn. Hemû xelkê Çwarçira û dordorên wê, ji xew şiyar kir, bi lêxistina her kesekî re ko destê wî digihiştê, weke şêr diqêriya, digot: Bijî Qazî Mihemed, bijî kurd, bijî serxwebûna gelê kurd, em dimirin, lê belê gelê kurd ti carî namire, hun xeyal dikin.

Ji ber ko dengê Mihemed Hisên Xan Seyfî Qazî dengekî mezin bû û bi xwe jî pir bi heybet û netirs bû, heta ew gihande ber sêdarê, bi mist û lingan, hin kes li erdê xistibûn, pir kes ji dengê wî ji xew rabûn, lê belê ji ber ko her ji êvarê ve rewşa awarte û qedexeya hatinçûyînê hatibû ragihandin, kes nediwêriyabû ji malê derbikeve.

Ew bi dar ve kir, lê belê piştî du deîqîqeyan werîsê sêdarê qetiya û bi erdê ket, dubare ew rakir û hê jî diqêriya. Ca bir ber sêdara sêyemîn ya ko ji Sedrî Qazî re hatibû amadekirin û dubare bi dar ve kir, wî çaxî seet bûbû pêncê sibê û dinya yekcarî rona bûbû.

Dor giha Ebulqasim Sedrî Qazî, lê belê ji ber ko bêtirî seetekê di kamyonê de û çav li rê mabû, gêj û hêr bûbû, herweha ji ber ko ew qasî ji cihê bidarvekirinê jî ne dûr bû, hinekî fêm kiribû ka karesat çi ye!. Dema ko ew daxist û xist odeyê de û dadger û mele û em dîtin, di cih de dest bi hêvîkirinê kir û got: Axir ti sûçên min nîne, hêvî dikim min bişînin Tehranê ji bo ko karê min hîn bêtir zelal bibe.

Meleyaê Mehabdî jê re got: Fihêtî ye, wa meke, ev qas hêvî meke, bi mêranî wek yên din be, cezayê dadgehê ye û divê bête pêkanîn, ca çima bi mêranî nemirî?, merdane jiyayî û merdane jî bimire, tu çima dilê dujminan bi xwe xweş dikî?! evana, dujminkarane we bi dar ve dikin. Van gotinên mele pir bandor lî wî kir, lewra jî rûnişt û dest bi nivîsandina wesyetnameyê kir.

Tiştê balkêş ew e ko efser Kiyomers Salih qala naveroka wesyetnameyên Sedr û Seyfî Qazî nekiriye, meger ko derfet

ji dilsoz û hogirên dîroka kurd re çê bibe ko di arşîvxaneya artêşa Îranê de, teksta wan wesyetnameyan jî bibînin û ji nû ve zindî bikin.

Kiyomers Salih piştre dinivîsîne: Dema ko dawî li wesyetnameya xwe anî, ber bi meydana bidarvekirinê ve bir, dema ko laşeyên Qazî Mihemed û Seyfî Qazî dîtin, rewşa wî aloz bû û haya wî ji xwe nema, nidikaribû xwe li ser lingan bigire, naçar û her çawa be srebazan werîs xiste stoyê wî û ew jî bi dar ve kir û dawî li karesata bidarvekirina hersê serdarên kurd hat.

Piştî bidarvekirina wan, otomobîla ko em ji Tehranê anîbûn, amade bû, hinekî dûrtirî meydana Çwarçira rawestiya bû, beriya wê hingê tiştên me di otomobîlê de hatibûn barkirin, bi lez grûpa dubare dadgehîkirinê û ez û hin serbaz swarî wê otobosê bûn û me ber bi Miyanduwaw û Tewrêzê ve da rê, seet dehê sibê em gihiştin Miyanduwawê.

Min qed bawer nedikir ko berpirsiyar û rêberên kurd ev qasî bi cerg û egîd in, heta niha jî dengê Qazî Mihemed ko digot: Xwedêwo, toleya mezlûman ji zaliman hilde, yan jî qêriya Seyfî Qazî ko hemû meydan û derdorên wê tijî kiribû û mist û pên li efser û serbazan dixistin, li ber çavê min û di guhê min de ne.

Min karibû her ji dûr ve hin wêneyên wî bigirim, nediwêriyam nêzî wî bibim û piştî bidarvekirina wan jî her ji dûr ve û bi hilêxistî min wêneyên wan girtin. Min welê didît ko diayên Qazî Mihemd dê qebûl bibin, lê belê nizanim kengê û çawa jî.

Hemû ev nivîsa we li jor xwendî, di hejmara 61-ê ya (Mahname)-ya artêşê ya 1325 - 1946 de bi vî awayî hatiye nivîsandin û çapkirin jî. Divê behsa wê yekê jî bikim ko di wesyetnameyê de pir paragraf û hevok hatine rakirin û piştrast im ev jî bi zanûbûn hatiye kirin, bi taybetî jî di wê beşê de ya ko şîretî gelê kurd dike, lê belê di wê belavokê de ya ko bi navê Wêjename bi taybetî û bi awakî nepenî ji efserên artêşê û cihên taybet re dihate çapkirin, tevî ko ew jî

hatiye sansorkirin, lê belê kêmtirî cihekî wê hatiye rakirin û dadgehîkirina hersê qaziyan bi dirustî tê de hatiye nivîsandin.

Di hejmareke piştre ya wê kovarê de efser Kiyomers Salih dibêje: Bi behaneya ko li dijî ewlekariyê ye, rê nehate dayîn Wêjenameya min jî bête weşandin. Herweha di dawiya nivîsa xwe de dibîje: Qazî Mihemed ji mele re got: Sibe vê wesyetnameyê û şîretên min jî bide xelkê bajarê Mehabdê. Qazî Mihemed şîretên xwe dane mele, lê belê piştî bidarvekirina Qaziyan, dadger nivîsa Qazî Mihemed ji meleyê kurd stand û da min û got: Ev dê paşerojê bibe fîtne, min jî welê di Wêjenameya xwe de weşand, lê belê piştre piştgirî nedan weşandina wê.

Herweha divê wê yekê jî bibêjim ko wesyetnameya malbatî, wesyetname û raspêriyên destxetî yên Qazî Mihemed yên ji gelê kurd re, herdu jî di Namexaneya Arteşa Îranê de, ango li (Bayeganî Nigarxenyî Milliyê Stadê Artêş), tevî hemû hejmarên Mahnameyê û Wêjenameya (Tac Kiyanî) jî hatine parastin.

Ji bilî vana, tev belgenameyên dadgehîkirina efser û mezinên serhildan û şoreşên seranserî Îranê, wek mînak, hemû naveroka dadgehîkirina efserên Xurasanê û Azerbêcanê û Qezwînê û Şîrazê û Tehranê û Esfehanê û dadgehîkirina efserên Tûde û serhildana artêşa şahenşahî û hêza esmanî û Eniya Gelêrî û alîdarên Dr.Museddeq û Sureyya ya jina Şah û Erdeşêrê kevne zavayê Şahê Îranê re, di wê Namexaneyê de, wek xwe hatine parastin.

Çavkanî:

- Wêjename (Tac Kiyanî) Wêjeya Fermandariya Artêşê.
- Kovara (Mahname) ya Artêşa Îranê.

ئەنجومەنی حکومەتی کوردستان

راگەیاندنی کۆمار
قازی محەمەد لە گۆڕەپانی چوارچرادا لە رۆژی ٢ی ڕێبەندان ١٣٢٤
(٢٢ی کانوون٢ ١٩٤٦) ، بارزانی لە پێشەوەی قازی لە خوارەوە

پێشەوا قازی محەممەد

سەرۆک کۆماری کوردستان پێشەوا قازی محەمەد و ژەنەراڵی
کۆماری کوردستان: مستەفا بارزانی

وەرنەگرت. هەروەها لە کۆتایی نووسینەکەیدا دەڵێ: قازی محەمەد بە مەلاکەی گوت:

بەیانی ئەو وەسیەتنامە و ئامۆژگارییانەم بدە بە خەڵکی مهاباد.

قازی محەمەد ئامۆژگارییەکانی دا بە مەلاکە، بەڵام دوابەدوای بەدارەوەکردنی قازییەکان، دادستان نووسراوەکەی قازی محەمەدی لە مەلا کوردەکە سەندەوە و دای بە من و گوتی: ئەمە لە دوا رۆژدا دەبێتە فیتنە. منیش وا لە وێژەنامەکەدا چاپم کرد، بەڵام دواتر پشگیریی لە بڵاوبوونەوەی نەکرا.

پێویستە ئاماژە بەوەیش بدەم کە وەسیەتنامەی خانەوادەیی و وەسیەتنامە و راسپاردەکانی دەستخەتی قازی محەمەد بۆ گەلی کورد، هەردووکیان لە نامەخانەی ئەرتەشی ئێراندا پارێزراون، واتە لە (بایەگانی نگارخانەی مللی ستادی ئەرتەش)دا، لە گەڵ هەموو ژمارەکانی ئەو (ماه نامە)یە و وێژەنامەی (تاج کیانی)دا. جگە لەمانە تەواوی بەڵگەنامەی دادگەکانی ئەفسەر و سەرانی راپەڕین و شۆڕشەکانی سەرتاسەری ئێران، بۆ نموونە تەواوی نێوەڕۆکی دادگەییکردنی ئەفسەرانی خوراسان و ئازەربایجان و قەزوین و شیراز و تاران و ئەسفەهان و دادگەییکردنی ئەفسەرە توودەییەکان و راپەڕینی ئەرتەشی شاهنشاهی و نیرووی هەوایی و جەبهەی مللی و لایەنگرانی دکتۆر موسەدیق و سورەییای ژنی شا لە گەڵ ئەردەشێری زاهیدی کۆنە زاوای شای ئێران، لەو نامەخانەیەدا وەك خۆیان پارێزراون.

سەرچاوە:

- وێژەنامە (تاج کیانی) وێژەی فەرمانداریی سوپا
- گۆڤاری (مەهنامە)ی سوپای ئێران

قەت باوەڕم نەدەکرد کە بەرپرس و ڕێبەرانی کورد ئەوەندە بە جەرگ و بە غیرەت و ڕەشید بن، تا ئێستاش دەنگی قازی محەمەد کە دیگوت: خودایە جەزای مەزلوومان لە زاڵمان وەربگرەوە، یاخود نەعرەتەی سەیفی قازی کە تەواوی ئەو مەیدانە و دەوروبەری پڕ کردبوو و زللە و پێلاقەی لە ئەفسەر و سەربازان دەدا، لە بەر چاو و لە گوێمدایە.
هەر لە دووررا توانیم چەند وێنەیەکی لێ بگرم و نەم وێرا لێی نزیك بکەومەوە، دوای لەسێدارەدانیشیان هەر لە دوورەوە وێنەم بە هەڵواسراوی لێ گرتن، پێم وابوو دووعاکانی قازی محەمەد قەبوڵ دەبن، بەڵام نازانم کەی و چۆن؟!

هەموو ئەو نووسینەی سەرەوە کە لە بەر دەستتاندایە، لە ژمارە (٦١) ی (ماهنامە) ی ئەرتەش، ساڵی (١٩٤٧) دا، بەو شێوەیە نووسراوە و چاپ کراوە. دەبێ ئاماژە بەوەش بکەم کە لە وەسیەتنامەکەدا زۆر پەرەگراف و رستە سڕاونەتەوە کە دڵنیام ئەمە بە ئەنقەست کراوە، بە تایبەت لەو بەشەی کە ئامۆژگاریی میللەتی کورد دەکات، بەڵام لەو بڵاوکراوەیەی کە بە ناوی وێژەنامە بە تایبەت و بە شێوەی نهێنی بۆ ئەفسەرانی ئەرتەش و شوێنی تایبەت چاپ دەکرا کەچی هەندێ جێگەی سانسۆر کراوە، بەڵام کەمتر شوێنێکی لادراوە و دادگاییکردنی هەر سێ قازییەکانی بە تەواوەتی تێدا نووسراوە.

لە ژمارەیەکی دواتری ئەو گۆڤارەدا، سەروان کیۆمەرس ساڵح دەڵێ: بە بەهانەی دژی ئەمنیەتبوونی من وێژەنامەکەشم ئیزنی بڵاوکردنەوەی

پیاوانە نەمری، مەردانە ژیاوی و مەردانەش بمرە، بۆ دڵی دوژمن بە خۆت خۆش دەکەی، ئەوانە دوژمنکارانە ئێوە لە دار دەدەن.

ئەو قسانەی مەلا زۆر کار لێ کرد، بۆیە دانیشت و دەستی کرد بە نووسینی وەسیەتنامە، بەڵام ئەوەی جێگای سەرنجە، سەروان کیۆمەرس ساڵح باسی ناوەرۆکی وەسیەتنامەی سەدر و سەیفی قازی نەکردووە، مەگەر دڵسۆزان و هۆگرانی مێژووی کورد لە نێو ئەرشیفخانەی ئەرتەشی ئێراندا هەڵی ئەوەیان وەدەست بکەوێ دەقی ئەو وەسیەتنامانەش بدۆزنەوە و ساخی بکەنەوە.

دواتر کیۆمەرس ساڵح دەنووسێ:
کە وەسیەتنامەکەی تەواو کرد، بەرەو مەیدانی لەسێدارەدانیان برد، کاتێك چاوی بە تەرمی قازی محەمەد و سەیفی قازی کەوت، حاڵی تێك چوو، بووڕایەوە، نەیتوانی خۆی بە پێوە بگرێ، ناچار هەر بەو حاڵەوە بە باوەشی سەربازانەوە پەتیان لە ملی کرد، ئەویش لە دار درا و کارەساتی لەسێدارەدانی هەرسێ سەرداری کورد، کۆتایی هات.

دوای لە سێدارەدانیان، ئەو ئۆتۆمبێلەی کە ئێمەی لە تارانەوە هێنابوو، ئامادە بوو، هەندێك دوورتر لە مەیدانی چوارچرا وەستا بوو، پێشتر شتومەکی ئێمە لە ناو ئۆتۆمبێلەکە بار کرابوو، بە پەلە هەیئەتی دووبارە پیاچوونەوە و دادگەییکردن و من و چەند سەربازێك سواری ئۆتۆبۆسەکە بووین و بەرەو میاندواو و تەورێز وەڕێ کەوتین، کاتژمێر (١٠) ی سەرلەبەیانی گەیشتنە میاندواو.

کەسێکی بە مست و پێلاقە خست، زۆر کەس لە دەنگی ئەو لە خەو راپەڕین، بەڵام چونکە هەر لە ئێوارێوە باری نائاسایی و قەدەغەی هاتوچۆ راگەیەنرا بوو، کەس زاتی لە ماڵ وەدەرکەوتنی نەکرد.

کە بە دارەوەیان کرد، دوای دوو دەقیقە پەتی سێدارە پچڕا و کەوتە خوارەوە، دووبارە بەرزیان کردەوە و هێشتا نەعرەتەی دەکێشا، ئینجا بردیانە بن داری سێیەم کە بۆ سەدری قازی ئامادە کرا بوو، دووبارە هەڵیانواسییەوە، سەعات بوو بە پێنجی بەیانی، دنیا تەواو رووناك ببوو.

نۆرە گەیشت بە ئەبولقاسم سەدری قازی، بەڵام لە بەر ئەوەی زیاتر لە چەند کاتژمێرێك بوو لە نێو کامیۆنەکەدا لە چاوەڕوانیدا مابووەوە، گێژ و وێژ ببوو. هەروەها، چونکە ئەوەندە لە شوێنی لەسێدارەدانەکەش دوور نەبوو، دەبێ گوێشی لە نەعرەتەکانی سەیفی قازی بوو بێت، بۆیە تا رادەیەك تێگەیشتبوو کە کارەسات چییە.

کاتێك دایان بەزاند و هاتە ژوورەکەوە، دادستان و مەلا و ئێمەی بینی، دەستی کرد بە پاڕانەوە و گوتی:

ئاخر من هیچ گوناهێکم نەکردووە، تکا دەکەم بمنێرن بۆ تاران با کاری من باشتر روون ببێتەوە.

ئاخوند، یا مەلای مەهابادی پێی گوت:

عەیبە، وا مەکە، مەپاڕێوە، پیاوانە وەکوو ئەوانی دیکە بە، تازە پاڕانەوە هیچ دەردێکت دەرمان ناکا. حوکمی دادگایە و دەبێ جێبەجێ بکرێ، جا بۆچی

له دوای ئەم مەراسیمانە، قازی محەمەدیان بردە ژێر پەتی سێدارە و لە داریان دا، زیاتر لە دوو دەقیقەی نەکێشا کە قازی محەمەد گیانی سپارد، کاتژمێریش ببوو بە (٤) ی نیوە شەو.
ئینجا ئاماژەیان بەو کامیۆنە کرد کە محەمەد حوسێن سەیفی قازی، وەزیری جەنگی کۆماری کوردستانی تێدا بوو بێتە مەیدان، سەیفی قازیشیان هێنایە ژوورەکەوە، کە چاوی بە دادستان و مەلا و سەرۆکی بەهداری کەوت، یەکسەر زانی کارەسات چییە، بەلام هیچ تێك نەچوو، نەگۆڕا و نە شێوا، دادستان حوکمی دادگای خوێندەوە، پێی گوت کە دەتوانێ وەسیەتنامەیەك بۆ خۆی بنووسێ، ئەویش چووە پشتی مێزەکە و تەواوی وەسیەتنامەکەی خۆی لە (١٠) لاپەڕەدا نووسی، کە تا ئەو کاتە، خەریك بوو بەیانی دادەهات، کاتێك بەرەو مەیدانیان برد و هەر کە چاوی بە قازی محەمەد کەوت، کەوا لە دوورەوە لە دار دراوە و لاشەکەی بە هەواوەیە، یەکسەر دەستی کرد بە دروشمی شۆڕشگێڕانە بە زمانی کوردی و بە مست و پێلاقە کەوتە سەر و گێلاك و گیانی ئەفسەر و سەربازەکان، لێدانی بەر هەر سەربازێك دەکەوت، دەیخست، نەعرەتەی سەیفی قازی وەك نەڕاندنی شێر وابوو. تەواوی خەڵکی دەوروبەر و نزیك و چوارچرای لە خەو راپەڕاند، لە گەڵ لێدانی هەر کەسێك کە دەستی پێڕا گەیشت، وەك شێر دەینەڕاند، دەیگوت:
بژی قازی محەمەد، بژی کورد، بژی ئیستقلالی میللەتی کورد، ئێمە دەمرین، بەلام کورد هەرگیز نامرێ، خەیاڵتان خاوە.
لە بەر ئەوەی دەنگی محەمەد حوسێن خان سەیفی قازی خۆی گەورە بوو و خۆیشی زۆر بە هەیبەت و نەترس بوو، تا گەیاندیانە ژێر سێدارە چەند

باشه بەڵام لە بەرنەوەی لە شەرعی ئیسلامدا لە رداردان کارێکی ناپەسەندە، کە دەمکوژن، تیربارانم بکەن.
بەڵام دادستان ئەو داواکارییەی لێ قبووڵ نەکرد، چونکە بڕیاری دادگە، خنکاندنی بە پەت بوو.
ئینجا قازی محەمەد گوتی:
نوێژ دەکەم و دەستووراتی بەر لە مردن جێبەجێ دەکەم.
ئیزنیان پێ دا .. بەرلەوەی بچێتە ژێر پەتی سێدارە، رووی لە قیبلە کرد و هەردوو دەستی بەرز کردەوە و لە خوا پاڕایەوە، بە دەنگێکی بەرز گوتی:
خودایە، تۆ خۆت شاهێدی کە من لە خزمەت بەو میللەتەدا هیچ خۆم نەبواردووە و کەموکوڕیم نەکردووە، خودایە تۆ شاهێدی کە من هەر چیەکم لە دەست هاتبێ لە رێگای تۆدا و لە پێناوی رازیبوونی تۆدا، کردوومە، خودایە بە گەورەیی خۆت تۆڵەی مەزلوومان لە زاڵمان لەو دنیایە و لە قیامەتدا بستێنەوە، کە دەزانم هەر وایە، ئەی خودای ئاگادار لە هەموو شتێك، هەموو میللەتانی ژێر چەپۆك و میللەتی کورد لە ژێر چنگی ئەو زاڵمانە رزگار بکە.
دواتر کیۆمەرس دەڵێ:
ئەم رێوەڕەسم و لەخوا پاڕانەوەیش نزیکەی (٢٠) دەقیقەی کێشا، هەروەها ئەو وشانەی کە قازی محەمەد بە کوردی دەیگوتن، واتا فارسیەکەیم لە مەلا کوردەکە کە لە وێ ئامادەبوو، دەپرسی.

هی خۆتان بێ، ئەو کاتە هەموو شتێکیان هەیە، هەم ماڵ، هەم سەروەت، هەم دەوڵەت و ئابڕو و نیشتمانیشتان دەبێ.

١٠- من پێم وانیە حەقی خودا نەبێ، حەقی دیکەم لە سەر بێ، بەڵام ئەگەر کەسێك لای وا بوو، لە کەم تا زۆر شتێکی لای منە، سەروەتی زۆرم جێ هێشتووە، با بچێ لە واریسانم داوا بکا و وەری بگرێتەوە.

تا ئێوە یەکتر نەگرن، سەرناکەون، زوڵم و زۆر لە یەك مەکەن، چونکە خوا زۆر زوو زاڵم لە بەین دەبا و نابوودی دەکا، ئەوە بەڵێنی خواوەندە بێ کەم و زیاد، زاڵم دەڕووخێ و نابوود دەبێ، خوا تۆڵەی زوڵمی لێ دەکاتەوە.

هیوادارم ئەوانە لە گوێ بگرن و خوا سەرکەوتووتان بکات بە سەر دوژمناندا، وەك سەعدی فەرموویەتی:

مراد ما نصیحت بود و گفتیم

حوالت باخدا کردیم و رفتیم

خزمەتگوزاری گەل و نیشتمان

قازی محەمەد

دوای تەواوبوونی قازی محەمەد لە نووسینەوەی وەسیەتنامەکەی، بە دادستانی گوت:

حەز دەکەی گوێ بگرە بۆت بخوێنمەوە؟

دادستان گوتی:

پێویست ناکات.

قازی محەمەد گوتی:

٣- خوێندن و زانست و پلەی زانیاریتان بەرنە سەردوە، بۆ ئەودی کەمتر فریوی دوژمنان بخۆن.

٤- باوەڕ بە دوژمنان مەکەن، بە تایبەت بە دوژمنی عەجەم، چونکە بە چەند هۆ و ڕێگاوە عەجەم دوژمنی ئێوەیە، دوژمنی گەل و نیشتمان و ئایینتانە. مێژوو سەلماندوویەتی کە بەردەوام لە کورد بە بەهانەیە و بە کەمترین تاوان دەتانکوژێ و لە هیچ تاوانێك بەرانبەر بە کورد دەست ناگێڕێتەوە.

٥- بۆ چەند ڕۆژێك ژیانی بێ قیمەتی ئەم دنیایە خۆتان مەفرۆشن بە دوژمن، چونکە دوژمن دوژمنە و جێگەی هیچ باوەڕپێکردنێك نییە.

٦- خیانەت بە یەکتری مەکەن، نە خیانەتی سیاسی و نە گیانی و ماڵی و نامووسی، چونکە خیانەتکار لای خودا و مرۆڤ سووك و تاوانبارە، خیانەت بە رووی خیانەتکاردا دەگەڕێتەوە.

٧- ئەگەر یەکێك لە ئێوە توانی کاردکانی ئێوە بە بێ خیانەتکردن ئەنجام بدا، هاوکاری بکەن، نەوەك لە پێناوی چاوچنۆکی و بەخیلیدا دژی بوەستن، یان خوا نەکا لە سەری ببن بە جاسووسی بێگانە.

٨- ئەو شوێنانەی لە وەسیتنامەکەدا نووسیومە بۆ مزگەوت و نەخۆشخانە و قوتابخانە، ئێوە هەمووتان داوای بکەن تا دەکرێ و سوودیان لێ وەردەگیرێ.

٩- ئێوە لە خەبات و هەوڵ و تێکۆشان مەوەستن، تا وەك هەموو گەلانی دیکە لە ژێر چەپۆکی دوژمنان رزگارتان دەبێ، ماڵی دنیا هیچ نییە، ئەگەر وڵاتێکو هەبێ، سەربەستیەکو هەبێ، ماڵ و خاك و نیشتمانەکەو

رانەدەوەستام، بۆیە نابێ لە گەڵ یەکتردا چاوچنۆك بن، ئەوانەی فەرمانی ئێمەیان بەجێ نەدەگەیاند، نەك هەر فەرمان جێبەجێ نەکردن، بەڵکو بە تەواوی دوژمنایەتیان دەکردین، لە بەر ئەوەی خۆمان بە خزمەتکاری خەڵکی خۆمان دەزانی، ئێستا ئەوان لە نێو ماڵ و منداڵی خۆیان، لە شیرین خەودان، بەڵام ئێمە بە ناوی خزمەتکردن بە میللەت، وا لە ژێر داری سێدارەداین و خەریکم دوایین ساتەکانی ژیانم بەم وەسیەتنامەیە تەواو دەکەم، جا ئەگەر منیش بەرپرسیاردتیی گەورەم لە سەر شان نەبووایە. ئێستا منیش وەك ئێوە لە ناو خاوخێزان و لە ماڵی خۆم لە شیرین خەودا دەبووم. ئەوەی کە ئامۆژگاریتان بۆ دوای خۆم دەکەم، ئەمەش یەکێکە لەو بەرپرسیاریەتیانەی کە لە سەر شانمە، دڵنیام ئەگەر کەسێکی دیکە لە ئێوە، بەرپرسیاریەتیەکانی منی وە ئەستۆی خۆی گرتبا، ئێستا ئەو لە شوێنی من لە ژێر سێدارە دەبوو، وا من بە مەبەستی رەزایەتیی خودا و بە پێی بەرپرسیاریەتیی سەر شانم، وەکوو کوردێکی خزمەتکاری گەل و لە رێگای کاری چاکدا (امر بالمعروف) ئەو چەند ئامۆژگارییەم کردن کە هیوادارم لەمەودوا عیبرەت وەربگرن و بە تەواوی گوێ لە ئامۆژگارییەکانم بگرن، بە هیوای خوای گەورە بە سەر دوژمنانتاندا سەرکەون.

١- باوەڕتان بە خودا و (ماجاء من عندالله) و پەرستنی خودا و پێغەمبەر (د.خ) و بەجێگەیاندنی ئەرکی ئایینی پتەو بێ.

٢- یەکێتی و تەبایی لە نێوان خۆتاندا بپارێزن، کاری نەشیاو لە بەرانبەر یەکتردا مەکەن و چاوچنۆك مەبن، بە تایبەت لە بەرپرسیاریەتی و خزمەتکردندا.

دڵنیام زۆر لە وانەی لە دوای ئێمەش دەگەونە داوی فڕ و فێڵی عەجەمان، لە ئێمەش زاناتر و لێهاتووتر دەبن، بەڵام هیوادارم کوشتنی ئێمە ببێتە پەند و عیبرەت بۆ دڵسۆزانی گەلی کورد. وەسیەتێکی دیکە بۆ ئێوە ئەوەی کە لە خوای گەورە داوا بکەن، هەر چیەکتان بۆ سەرفرازیی ئەو گەلە کرد، کۆمەکتان لە ئەو بۆ بێ، دڵنیام خوای گەورە سەرتان دەخا و کۆمەکتان دەکا. رەنگە بڵێین ئەی بۆ من سەرنەکەوتم، لە وەڵامدا دەڵێم: بەو خوایە من سەرکەوتووم، چ نیعمەتێك و چ سەرکەوتنێك لەوە گەورەترە کە ئێستا وا من لە رێگەی گەل و میللەت و وڵاتەکەمدا، سەر و ماڵ و گیانم لە پێناوی ئەودا دادەنێم، باوەڕ بکەن من خۆم لە دڵمەوە ئارەزووم بوو، ئەگەر مردم بە مەرگێك بمرم کە لە حزووری خوا و رەسوولی خوا و گەل و میللەتەکەمدا، روو سوور بم، بۆ من ئەو مەرگە سەرکەوتنە.

خۆشەویستەکانم کوردستان ماڵی هەموو کوردێکە، هەر وەکوو لە ماڵەوەدا ئەندامانی ئەو ماڵە هەر کەس لە هەر جۆرە کار و کردەوەیەکدا دەیزانێ، ئەو کارەی پێ دەسپێرن، ئیتر کەس مافی چاوچنۆکی پێ نییە، کوردستانیش هەر ئەو ماڵەیە، ئەگەر زانیتان کەسێك لە ئەندامانی ئەو ماڵە کارێکی لە دەست دێ، لێی گەڕێن با بیکا. ئیتر نابێ بەرد بخەنە سەر رێی و نابێ بەوە دڵگیربن کە یەکێك لە ئێوە بەرپرسیاریەتیی گەورەی بە دەستەوەیە، ئەگەر کاری گەورە کەوتۆتە سەر شانی کەسێك و بەڕێوەی دەبا، دیارە لێی دەزانێ و بەرپرسیاریەتیی گەورەتریش لە بەرانبەر ئەو ئەرکەدا هەیە.

دڵنیابە برا کوردەکەت هەر چاکترە، دوژمن کینەی لە دڵە و ئەگەر من بەرپرسیاریەتیی گەورەم لە سەر شانی نەبوایە، ئێستا لە ژێرداری سێدارەدا

حیله گرتوویانن و کوشتوویانن، چونکه له مەیدانی نەبەردیدا پێیان نەوەستان و نەیان توانیوە لە بەرانبەریاندا رابوەستن، ناچار به درۆ و فڕ و فێڵ هەڵیان خەڵەتاندوون، کوشتویانن.

من ئەوانم هەر هەموویان لە بیر بوو، قەتیش باوەڕم بە عەجەمان نەکردووە، بەڵام عەجەم لە پێش گەڕانەوەیان بۆ ئێرە چەندین جار وەڵام و راسپاردەیان بە نامە و بە ناردنی کەسی ناوداری کورد و فارس بە دانی بەڵێن و پەیمانی یەکجار زۆر و بۆردەوە کە دەوڵەتی عەجەم و شا خۆی نیەتی خێریان هەیە و ئامادە نین تەنانەت دڵۆپێك خوێن لە کوردستان برژێ.

ئێستا ئێوە ئەنجامی بەڵێنەکانیان بە چاوی خۆتان دەبینن، ئەگەر سەرانی هۆز و عەشیرەتە کوردەکانمان خیانەتیان نەکردبا و خۆیان بە حکوومەتی عەجەم نەفرۆشتبا، ئێمە و ئێوە و کۆمارەکەمان، وای بە سەردا نەدەهات.

ئامۆژگاری و وەسیەتم ئەوەیە: با مندالەکانتان بخوێنن، چونکە ئێمەی میللەتی کورد هیچمان لە میللەتانی دیکە کەمتر نییە، ئیللا خوێندن نەبێ، بخوێنن بۆ ئەوەی لە کاروانی گەلان دوا نەکەن، هەر خوێندن چەکی کوشندەی دوژمنە.

دڵنیا بن ئەگەر تەبایی و یەکگرتن و خوێندەواریتان باش بێ، زۆر باشیش بە سەر دوژمنانتان سەر دەکەون. ئێوە نابێ بە کوشتنی من و برا و ئامۆزاکانم چاوتان بترسێ، هێشتا دەبێ زۆر کەسی دیکەی وەکو ئێمە گیانیان لەو رێگایەدا بەخت بکەن، تا دەگەنە ئاوات و مەبەستتان.

دڵنیام لە دوای ئێمەش زۆر کەسی دیکە هەر بە فێڵ و دووڕوویی لە بەین دەبرێن.

خواردووه و باوڕی پێ هێناون، کەچی تا ئێستاش بە درێژایی مێژوو، کەس نەیدیوە تاکو جارێکیش عەجەم بە سوێند و وادە و ئەو پەیمانانەی کە بە سەرانی کوردی داوە، وەفای پێ بکا و وادەکانی لە گەڵ کورد بەجێ بگەیەنێ، هەر هەمووی درۆ و فڕ و فێڵ بووە، جا وا من وەکوو برایەکی چووکەی ئێوە، لە ڕێگای خوادا، بۆ خاتری خودا پێتان دەڵێم: یەکتر بگرن و قەت پشتی یەکتر بەرمەدەن، دڵنیا بن ئەگەر عەجەم هەنگوێنتان بداتێ، دیارە ژەهری تێ کردووە، بە سوێند و بەڵێنی درۆی عەجەم فریو مەخۆن، کە ئەگەر هەزار جار دەست لە قورئانی پیرۆزیش بدا و بەڵێنتان پێ بدا، دڵنیابن تەنیا مەبەستی فریودانی ئێوەیە، تاوەکو فێڵێکتان لێ بکا.

وا من لە دوایین ساتەکانی ژیانمدا بە خاتری خودای گەورە ئامۆژگاریتان دەکەم، پێتان دەڵێم و خوا بۆ خۆی دەزانێ کە من ئەوەی لە دەستم هات، بە سەر و بە گیان و تێکۆشان، بە ئامۆژگاری و ڕێنوێنی و ڕێگەی ڕاست نیشاندانی ئێوە، درێغیم نەکردووە، ئێستاش لەو ساتەدا و لەو بارودۆخەدا، دیسان پێتان ڕادەگەیەنم کە چیتر فریوی عەجەم نەخۆن و باوەڕ بە سوێند و دەست لە قورئاندان و بەڵێن و سۆزەکانیان مەکەن، چونکە عەجەم نە خوا دەناسن و نە باوەڕیان بە خوا و پێغەمبەر هەیە و نە باوەڕیان بە ڕۆژی قیامەت و حیساب و کیتاب هەیە، لە لای ئەوان ئێوە هەر لە بەر ئەوەی کە کوردن، با موسڵمانیش بن، تاوانبار و مەحکوومن، بۆ وان دوژمنن، سەر و ماڵ و گیانتان بۆ ئەوان حەلاڵە و بە غەزای دەزانن، بەڵێنم وانەبوو من بڕۆم و ئێوە بە دەست ئەو دوژمنە دڵڕەشانەوە بەجێ بهێڵم، زۆر جاریش بیرم لە رابردوو و گورە پیاوانمان کردۆتەوە، کە عەجەم بە فریو و سوێند و درۆ و

هەر میللەتێك یەکێتی و تەبایی نەبێ، هەردەم ژێردەستی دوژمنانی دەبێ، ئێوە گەلی کورد، هیچتان لە گەلانی سەر ئەم گۆی زەویە کەمتر نییە، بەڵکوو لە پیاوەتی و غیرەت و لێهاتوویی، لە زۆر لەو گەلانەی کە رزگاربوون لە پێشترن. ئەو میللەتانەی کە لە چنگی دوژمنە زۆردارەکانیان رزگاریان بوو، وەك ئێوەن، بەڵام ئەوانەی خۆیان رزگار کردووە، یەکێتیان لە نێواندا هەبووە، با ئێوەش وەکوو هەموو گەلانی رووی زەوی، چیتر ژێردەست نەبن، هەر بە یەکگرتن و حەسوودی بەیەك نەبردن و خۆنەفرۆشتن بە دوژمنان لە دژی نەتەوەکەمان دەتوانن رزگار بن.

براکانم چیتر فریوی دوژمن مەخۆن، دوژمنی کورد هەر رەنگ و دەستە و قەومێك بێت، هەر دوژمنە، بێ رەحمە، بێ ویژدانە، روحمتان پێ ناکا، بە یەکترتان بە کوشت دەدا، تەماحو وەبەردەنێ، بە درۆ و فڕ و فێڵ بەگژ یەکترووداد دەکا، لە ناو هەموو دوژمنەکانی گەلی کورد، دوژمنی عەجەم لە هەموویان زاڵمتر و مەلعوونتر و خوانەناستر و بێبەزەییترە، لە هیچ تاوانێك بەرانبەر بە گەلی کورد دەست ناگێڕێتەوە، هەر بە درێژایی مێژوو لە گەڵ گەلی کورد، غەرەز و کینەی ریشەداری هەبووە و هەیەتی، تەماشا کەن بڕوانن تەواوی گورە پیاوانی گەلەکەتان، لە سمایل ئاغای شکاکەوە بگرە، تا جەوهەر ئاغای برای و هەمزە ئاغای مەنگوڕ و چەندین مرۆڤی دیکە، هەر هەموویان بە فریودان ئارامیان کردنەوە و خەڵکیان لە پشت کردنەوە و ئینجا زۆر نامەردانە، کوشتیانن، هەموو ئەوانەیان بە سوێند و قورئان فریو دان کە گوایە عەجەم نیەتی خێری لە گەڵیاندا هەیە و چاکەیان لە گەڵدا دەکات، بەڵام هەر کوردی خۆش باوەڕە و بە سوێند و سۆزی عەجەم فریوی

لێرەدا کۆمەرس سالح دەڵێ:
قازی محەمەد بەمەبەستی ئەوەی هەموو ئێمە لە قسەکانی تێ بگەین ئەو شتانەی بە فارسی بە مەلا دەگوت و پێی گوت:
تۆ بە کوردی بیان نووسە
مەلا گوتی:
قوربان نازانم بە کوردی بنووسم.
قازی محەمەد تووڕە بوو و گوتی:
ئەمەش یەکێکی دیکە لە بەدبەختیەکانی گەلی کورد.
لە درێژەی ئەم باسەدا کیۆمەرس دەنووسێ: ئینجا قازی محەمەد دووبارە خۆی دەستی بە نووسینی وەسیەتنامەکەی کردەوە. بەم شێوەیەی خوارەوە کە بە خەتێکی زۆر خۆش نووسیویەتی:

بسم الله الرحمن الرحیم
میللەتی رۆڵە و برا عەزیزەکانم، برا بەش خوراوەکانم، میللەتە زوڵم لێکراوەکەم، وام لە دوایین ساتەکانی ژیانمدا، چەند ئامۆژگاریەکتان دەکەم، وەرن بە خاتری خوا چیتر دوژمنایەتیی یەکتر مەکەن، یەك بگرن و پشتتان وەیەکتری بدەن، لە بەرابەر دوژمنی زۆردار و زاڵم بوەستن، خۆتان بە خۆڕایی بە دوژمن مەفرۆشن، دوژمن هەر ئەوەندە ئێوەی دەوێ، تا کاری خۆی پێتان جێبەجێ دەکات و قەت بەزەیی پێتاندا نایە، لە هەر هەلێکدا بێ، قەت لێتان نابووری.
دوژمنانی گەلی کورد زۆرن، زاڵمن، زۆردارن، بێ بەزەیین، رەمزی سەرکەوتنی هەر گەل و نەتەوەیەك یەکگرتن و یەکبوونە، پشتگیریی تەواوی میللەتە.

قازی محەمەد زۆر بە روونی ئەوەی دەیگوت پێی نووسی و گوتی: بنووسە فلان زەوی و فلان جێگە و فلانە بۆ مزگەوت و قوتابخانە و نەخۆشخانە بێ، تا بۆ گەلی کورد و ئەوەی داهاتوو، سوودی لێ وەربگیرێ. ئامۆژگاریی یەکگرتن و پێکەوەژیان و خۆشەویستی بۆ کورد کرد.

کاتێك وەسیەتنامەکەی بۆ بنەماڵەی خۆی تەواو بوو دەستی بە نوێژکردن کرد، تۆبە و لە خوا پاڕانەوەی بەجێ گەیاند، ئەم کارە نزیکەی دوو کاتژمێر و نیوی خایاند، دادستان لە بەسەرچوونی ئەو ماوەیە دوور و درێژە زۆر ناڕەحەت و نیگەران بوو، بە پەلەبوو بۆ گەڕانەوەی تاران.

دوای ئەوەی قازی محەمەد وەسیەتنامەکەی نووسی و نوێژ و لەخوا پاڕانەوەی بەجێ گەیاند، داوای کرد کە ئیزنی بدرێ چەند وەسیەت و ئامۆژگاری بۆ خەڵکی کورد بنووسێ. دادستان ئیزنی ئەوەی پێ دا و داوای قەڵەم و کاغەزی کرد، بۆیان هێنا. هەر بۆ ئەوەی دادستان سەرهەنگ نیکۆزاد و هەموو ئامادەبووان گوێیان لێ بێ و حاڵی ببن، بە مەلای گوت:

وەرە بینووسە.

گوتی:

مەلا هەرچی من پێت دەڵێم تۆ هەر ئەوە دەنووسی.

مەلا گوتی:

قوربان چی بنووسم، بزانم ئەوەی جەنابت دەتەوێ من بینووسم، بزانین دادستان ئیجازەی ئەوەت پێ دەدا؟!

قازی محەمەد تووڕە بوو و گوتی:

دادستان کێیە ئیزن بە من بدا، یان نەدا داخۆ دەمەوێ بڵێم چی؟!

ئۆتۆمبیل گەیشتە پێش دەرگای ئەو خانووەی مەیدانی چوارچرا، قازی محەمەد پرسیاری کرد:
بۆ دەبێ لێرە دابەزم؟!
ئەفسەر پێی گوت:
سەفەرەکەی تۆ لێرەوە بەرەو تاران رێك دەخرێ و چەند پرسیارێکی لاوەکی ماوە لێرە لێتان دەکرێ.
قازی محەمەد دابەزی، کاتێك هاتە ناو ڕاڕەوەکەوە، دیتی دادستان سەرهەنگ نیکۆزاد و مەلایەکی کوردەواری و چەند سەربازێکی چەکدار، هەروەها مێزێکی گەورە و قورئانێك کە لە سەر مێزەکە دانراوە، لە ژوورەکەن، هەروەها سەرۆکی (بەهداری) تەندروستی کە تازە لە تارانەوە بۆ مەهاباد هاتبوو، لە وێن. لە ناو ژوورەکەدا یەکسەر تێگەیشت کە چوونی تاران درۆیە، بە فریو هێناویانن بۆ چوارچرا.
دادستان سەرهەنگ نیکۆزاد دەستی بە خوێندنەوەی حوکمی دادگا کرد و قازی محەمەدی حالّی کرد کە دەبێ هەر ئێستاکە ئەو حوکمە جێبەجێ بکرێ.
بە قازی محەمەدی گوت:
ئەگەر وەسیەتێکتان هەیە، بیکە، یاخود بینووسە.
قازی محەمەد زۆر بە گورج و گۆڵی چووە پشت مێزەکە و دەستی بە نووسینی وەسیەتنامەکە کرد، تا چەند لاپەڕەیەکی نووسی، پاشان دیاربوو ماندوو بووە، بۆیە بە مەلای مەهابادی گوت:
وەرە ئەوەی من دەیڵێم بینووسە.

نا، پێویست ناکات، بەرپرسانی پلەبەرز پارەیان داوەتە ئەفسەری بەرپرسی ئەو کارە بۆ خەرجیی ئێوە، بۆیە پێویست بەوە ناکات ئێوە پارە لە گەڵ خۆتان بهێنن.

بە پێی بڕیار، هەریەکە لە قازییەکان لە گەڵ دە کەس چەکداری چاودێر سواری لۆرییەك کران، بەڵام هەر لە ئێوارەی ئەو ڕۆژەوە فەرماندار بارودۆخی نائاسایی لە شار ڕاگەیاندبوو، هەر جۆرە لە ماڵ وەدەرکەوتنێك قەدەغە بوو، تەواوی ناو شار و دەوروبەریش بە ئەفسەر و سەرباز تەنرابوو، لە ماوی کاتژمێرێکدا هەریەکە لە قازییەکان بە جیا لە گەڵ (١٠) سەرباز سواری ئۆتۆمبیل کران، قازی محەمەد لە ناو یەکەم ئۆتۆمبیل و محەمەد حوسێن سەیفی قازی لە ئۆتۆمبیلی دووەم و ئەبولقاسم سەدری قازی لە ئۆتۆمبیلی سێیەمدا، لە نێو ماشێندا چاوەڕوانی دەستوور بوون کە وەڕێ بکەون، بەڵام لە تارانەوە دەستوور درابوو گوایە بۆ ترساندنی خەڵکی کورد و پەند و عیبرەت وەرگرتنیان، لە مەیدانی چوارچرای ناو شاری مەهاباد، بە هۆی هەڵواسین بە دارەوە لە سێدارە بدرێن.

فەرمانداری مەهاباد لە کاتی هاتنی دەستەی دادگە بۆ مەهاباد، ئەو خانووەی کە لە مەیدانی چوارچرا بوو بە دانیشتوانی چۆڵ کردبوو، ئەو خانووە سێ نهۆم بوو و هەر سێ نهۆمەکەی پێ چۆڵ کردبوون، بە بەهانەی ئەوەی گوایە شەو ئەفسەری چاودێری شار لە وێ دەبێ. ئەو خانووە سێ دەرگای هەبوو یەکێك لە دەرگاکان بۆ مەیدان و یەکێك بۆ حەوشەیەکی بچووك کە هەی بوو. دەستووری ڕۆیشتنی ئۆتۆمبیلی قازی محەمەد بەرەو مەیدان درا، کە

حوکمەکە، دەبێت دەستەی دادگە لەوێ ئامادە بن، ناچار ماینەوە تا لەسێدارەدانی قازییەکان بەڕێوە بچێ.

هەر سێ قازیەکان لە دوای دادگەییکردنەوە لە نێو پادگاندا لە ژوورێکدا دانرابوون، بەڵام دەورادەوری ئەو خانووە بە چاودێر و چەکدار، چاودێریی دەکرا، نەبادا نیەتیان بێت خۆیان ڕزگار بکەن.

بڕیار درا یەکە یەکە لە ئۆتۆمبیل سوار بکرێن و هەر ئۆتۆمبیلێك (١٠) سەربازی لە تەك سوار بێ. پێیان گوتن: دەتان نێرین بۆ تاران. فەرمانداری مەهاباد دەستوری بە ئەفسەرێك دا کە: بڕۆ یەك یەکەیان بهێنە بۆ مەیدانی چوارچرا.

کیۆمەرس سالّح دەنوسێ:

منیش بۆ تەواوکردنی ڕاپۆرتەکەم، بۆ گۆڤارەکەم چوومە بەندیخانە، کاتێك لە گەڵ ئەفسەرێکدا چووینە ناو بەندیخانەکەوە، بینیمان قازی محەمەد خەریکی نوێژکردن بوو، ئەفسەر هەواڵەکەی بە قازیەکان ڕاگەیاند و پێی گوتن: خۆتان کۆ کەنەوە، دەنێردرێنە تاران، هەردوو سەدر و سەیفی قازی بە تایبەتی ئەبولقاسم زۆری پێخۆش بوو، دواتر کە قازی محەمەد سلاّوی نوێژی دایەوە، بینیمان کە هاتنی ئێمە و ئەو هەواڵە هیچ کاری تێ نەکردووە، بە پەلە جلوبەرگ و شتومەکی خۆیان کۆ کردەوە و ئامادە بوون.

گوتیان مادەم دەچین بۆ تاران، ئیزن بدەن هەواڵ بە ماڵەوەمان بدەین با پووڵ و پاردیەکمان بۆ بهێنن بۆ خەرجیی ڕێگا.

ئەفسەرەکە گوتی:

دەلەرزن و زۆر بەپەلە بە هۆی بێتەلەوە خەریکی پەیوەندیکردنە، هەستمان کرد کە توندترین بڕیار وەرگیراوە.

لە کاتێکدا وا بڕیار بوو ئەو شەوە تەنیا نیو کاتژمێر پەیوەندیی بێتەل دەگەڵ تاراندا هەبێ، بەڵام ئەو شەوە دیاربوو ستادی ئەرتەش و دەرباری شا، تا بەیانی چاوەڕوانی ئەنجامی کۆتایی دادگەکە بوون.
ئەوەی راستی بێ دووبارە پێداچوونەوە و دادگەییکردنەوەش هەر هەمان ئەو تاوانانەی دادگەی مەیدانی پێشووی دووبارە کردنەوە و بۆ هیچ لە تاوانەکان بەلگەی پێویستی نەخستە روو، هیچیش گوێیان بە رەتکردنەوەی تاوانبارەکان (قازییەکان) نەدا و بڕیاری لەسێدارەدانی هەرسێکیانی پەسەند کرد.

ئیتر کەوتنە خۆ شوێنێك لە ناو شاردا بدۆزنەوە، تا داری سێدارەیان لێ هەڵبخەن. دیاربوو فەرماندارى سەربازی زووتر لەوەی بڕیاری دادگە وەربگیرێ، رۆژێك زووتر ئەو خانووەی لە چوارچرایە و چەند نهۆمە، دەستنیشان کردبوو، یانی هەر لە هەوەڵەوە شوێنی لەسێدارەدانیشیان دەستنیشان کردبوون.
فەرماندار گوتی:
شوێنی پێویستمان ئامادە کردووە.
سەرەتا ویستیان جێبەجێکردنی حوکمەکە بۆ فەرمانداریی مەهاباد بەجێ بهێڵن و ئێمە دەگەڵ دەستەی دادگە خۆمان بەرهەف کرد بگەڕێینەوە تەورێز و لەوێوە بەرەو تاران بڕۆین، بەڵام لەناکاو فرەمان هات تا جێبەجێکردنی

ئەو كارانە جاسووسی بووە بۆ رووسەكان؟!
بەلام ئەبولقاسم سەدری قازی ئەو بۆچوونەی رەت كردەوە و گوتی: جاسووسی بۆ كێ، بۆچی، چی لە ولاتی ئێمەدا هەبوو كە رووسەكان وەك ئەوی هەبووە، نەیاندیبێ، شتێك، جێگەیەك هەیە كە رووسەكان خۆیان بۆی نەچووبن.
ئینجا دادستان ناوی چەند نامەیەكی دیكەی هێنا كە ئاوا و ئاوات نوسیوون.
ئەبولقاسم گوتی:
هەر شتێكم بۆ هەر جێگایەك نوسێبێ، دانەیەكم لای خۆم هێشتۆتەوە. تكایە پەرودندە (دۆسیە)ی ئێمە بنێرن بۆ تاران، نامە و بەلگەنامەكانی من هەمووی لە وێیە، باشتر ڕوون دەبێتەوە كە من چیم بۆ كوێم نوسیووە.

بەم شێوەیە دادگەییكردنی دووبارەی هەر سێ قازییەكان تەواو بوو، دەستەی دووبارە دادگەییكردنەوە كەوتنە گفتوگۆ، بە پێچەوانەی دادگەییكردنی مەیدانیی پێشوو كە لە كەمتر لە نیو كاتژمێردا گفتوگۆی خۆیان براندەوە و بڕیاری خۆیان وەرگرت، دەستەی دووبارە دادگەییكردنەوە، بڕیاردانیان ماوەی زیاتر لە ١٠ كاتژمێری خایاند، لەو ماوەیەدا، پەیوەندیی بێتەل لە نێوان مەهاباد و تاراندا بەردەوام بوو، تا ئەوەی كاتژمێر دوانزەی نیوە شەو دادگە بڕیاری وەرگرت و بڕیاری لەسێدارەدانی هەرسێ قازییەكانی بڕیەوە و زۆر بەپەلە ئەو بڕیارە بە تارانیش ڕاگەیەنرا. كەچی هیچ كام لە قازی محەمەد و سەدر و سەیفی قازی و ئێمە، لە بڕیارەكەی تاران تێ نەدەگەیشتین، بەلام كاتێك بینیان ڕەنگ و رووی فەرمانداری سەربازی زۆر گۆڕاوە و دەستی

ئایا مەبەست لەو نامەیە چی بوو کە بۆ قازی محەمەدتان نووسیوە و داوات لێ کردووە خۆ راگرن، تا کۆمەکتان دەگاتێ.

سەدری قازی:

هەرگیز شتێکی وا لە ئارادا نییە و ئەگەر دەڵێن بووە، فەرموون بیخەنە ڕوو.

ئینجا دادستان گوتی:

ئەی ئەو شیعرە چییە کە بۆ بارزانیت نووسیوە؟!

سەدری قازی:

بەڵێ ئەوە من نووسیومە، خۆشم ویستووە، شیعرم بۆی نووسیوە.

دادستان دووبارە پرسیاری کردەوە:

ئایا ئەو یارمەتییەی کە تۆ نووسیوتە پێشتریش بووە، یان بۆ جاری یەکەم بووە کە لە لایەن بێگانەوە کۆمەکتان پێ بکرێ! !

دیسان سەدری قازی گوتی:

ردتی دەکەمەوە، شتێکی وا نەبووە.

ئینجا دادستان گوتی:

بۆچی لە تەورێز لە گەڵ پیشەوەری کۆبوونەوەت کردووە و وتوووێژتان لە گەڵ (ئەماز عەلییۆف) فەرمانداری سەربازیی رووس لە میاندواو و ئەلکساندەر لە مەراغە و کۆنسوڵی رووس لە ورمێ، هاتووچۆ و دانیشتن و کۆبوونەوەتان لە گەڵیدا کردووە؟.

ئەبولقاسم گوتی:

ئەوانە پێویستییەکانی رۆژگار بوون.

دادستان گوتی:

سەرهەنگ، وا دیارە جگە لەوەی هیچ لەبارەی منەوە نازانی، شتێکی ئەوتۆش لە کار و دابونەریتی دادگە و دادڕەسیش نازانی.
لێرەدا، چونکە سەرهەنگ هێشتا لە جنێوەکانی قازی محەمەد تووڕە بوو و دڵی پڕ بوو و هەستی بە تێکشکان و دۆڕان دەکرد، ویستی بەهانەیەك بە سەیفی قازی بگرێ و خۆی تورە بکات، بەڵام سەیفی قازی ئاگادری کردەوە و پێی گوت:
ئێمە تازە دەستمان لە ژیان و ماڵی خۆمان شوشتووە و ئەگەر بە قەد تۆزقاڵێك بێ ئەدەبی و جەساردت بکەی، من وەکوو قازی محەمەد نیم هەر بە قسە و جنێودان وازت لێ بهێنم.
مستی خۆی گرێ کرد و بە سەرهەنگی نیشان دا و پێی گوت:
بەو مستە سەر و گوێلاك و دەم و ددانت دەشکێنێم، ئاخر لە مەرگ زیاتر کە ئاواتی ئێمەشە، هیچی تر هەیە، یەك ملیۆن درۆ و بوختان و قسەی قۆڕ و شتی دیکەتان، شتی دیکەی بێ واتاتان بۆ دروست کردوین، ئەوجا خەریکن غەڵەت و ناماقووڵیی زیاتریش دەکەن!.
هەموو ئەو درۆ و بوختانانەی کە سازتان کردووە، هیچ بنەما و بناغەیەکیان نییە، بەڵام ئێستا من لێرە ڕادەگەیەنم کە ئەو هەموو درۆ و بوختانانە، بە شانازییەوە لە سەر خۆم قبووڵ دەکەم، ئیتر ئامادە نیم هیچ وەڵامێکتان بدەمەوە.

بەم شێوەیە دووبارە دادگەییکردنەوەی سەیفی قازیش کۆتایی هات. ئنجا نۆرە گەیشتە ئەبولقاسم سەدری قازی و هێنایانە بەردەم دادستان و یەکەم پرسیار کە ئاراستەیان کرد ئەوە بوو:

دەسەڵاتداریدا، کەس لە عەجەم زاڵمتر و بێبەزەیی و کەللەڕەقتر و دڵڕەشتر نییە.

بەم شێوەیە دادگەییکردنەکەی قازی محەمەد کۆتایی هات، ئنجا نۆرەی محەمەد حوسێن خانی سەیفی قازی هات و زۆر بە هەیبەت و ویقار و لە سەرخۆیی و بوێری هاتە ژوورەوە و هەر پێی وانەبوو ئەمە دادگەییکردنیشە.

سەرهەنگ نیکۆزاد هاتەوە سەر شوێنی ڕەسمیی خۆی و ڕووی لە سەیفی قازی کرد و دەستی بە پرسیار کرد.

پرسیار:

تۆ چۆن بووی بە وەزیری جەنگ و ئەو بەرپرسیارییەتییە (پووشاڵی) کارتۆنییەت وەرگرت و مەبەستت لەم کارە چی بوو؟.

سەیفی قازی:

من بە شانازییەوە ئەو ئەرکەم وەرگرت و مەبەستم خزمەت بە گەلەکەم بوو و هیچی تر.

پرسیار:

مەبەستت خزمەت بوو، یان بۆ ئەوە بوو لە ڕێگای مەسئوولیەتدا پووڵ وەسەریەك بنێی و پێی بژی.

سەیفی قازی، بە پێکەنینەوە:

سەرهەنگ مەگەر تۆش من ناناسی، جگە لەوەی کە هەر بۆ پووڵ ئەوەم نەکردووە، بەڵکو من مەبلەغی (٢) ملیۆن تومەنم بۆ میللەت و کۆماری کوردستان خەرج کردووە کە دارایی و سەروەتی تایبەتی و کەسیی خۆم بووە.

سەرهەنگ عەتا:

بە راستی داوات لێ دەکەم وەڵامی ئەو پرسیارەشم بدەوە، کە ئەوەندە هۆگریت بە میللەت و وڵاتەکەت هەیە. بۆ چی و چۆن بوو ئیجازەت بە بێگانە دا بێتە ئەم وڵاتە و ببێتە سەربازی گەلەکەت.

قازی محەمەد:

ئەوەندە ئەو وشەیە دووبارە دەکەنەوە، دیارە مەبەستتان هێزەکانی ڕووس و ئینگلیزە؟!.

سەرهەنگ عەتا:

نا.. مەبەستم مەلا مستەفا بارزانییە!!

قازی محەمەد بە پێکەنینەوە گوتی:

دەمێکە وەڵامی ئەو پرسیارەتانم داونەتەوە، دووبارە گوتنەوەی پێ ناوێ، پێم گوتن بارزانی نە من هێناومە و نە بێگانە و نە غەیرە کوردیشە. مەلا مستەفا کوردە و کوردستان ماڵی هەموو کوردێکە و مەلا مستەفا بارزانیش وەکوو ئینسانێك لە بەشێکی ماڵەکەی خۆی هاتۆتە بەشێکی دیکەوە، هەموو کەسێکیش مافی ئەوەی هەیە لە هەر شوێن و لایەکی ماڵەکەی خۆیدا دابنیشێ و ئەوە مافی خۆیەتی و باش باش بزانن من خۆم حەزم نەدەکرد بڕۆم، دەنا من چەندین ئۆتۆمبێلم لە بەردەستدا هەبوو، هەر کاتێك و ساتێك مەیلم هەبوایە، دەمتوانی بڕۆم و لە خاکی ئێران دەربچم. زۆر باشیش لە سەرەنجامی کارەکەی خۆم ئاگادار بووم، ئێوەشم زۆر باش دەناسی، هەر وەك بارزانی گوتی: ئێوەی عەجەم لە کاتی زەلیلیدا کەس نازانێ و ناتوانێ وەك ئێوە بپاڕێتەوە و مەزلوومیەتی خۆی نیشان بدا، بەڵام لە کاتی

ڕۆژێك بێت ئەو ئالآیە بە دەستی توانا و بەهێزی بارزانی، لە سەر ئەو خانووەی کە منی تێدا دادگەیی دەکرێم و لە سەر هەموو شوێنە بەرزەکانی کوردستان بشەکێتەوە.

سەرهەنگ عەتا:

دوایین پرسیار، ئایا بە ڕاستی خۆت نەچووی، یان مەلا مستەفا دەگەڵ خۆی نەیبردی و نەیویست لە گەڵیدا بیت؟!

قازی محەمەد:

وا دیارە ئەوانەی ئێستا من گوتوومە، باوەڕت پێیان نییە؟!

سەرهەنگ عەتا:

نا.. حەز دەکەم ڕاستییەکەم پێ بلێی ! !

قازی محەمەد:

سەرهەنگ پێت رادەگەیەنم کە تۆش ئیهانە نەکەی! یانی چی ڕاستییەکەت پێ بلێم!؟ نا.. من بۆ کوێ دەڕۆم، ئێرە خاکی کوردستانە! باب و باپیرانم لێرە ژیاون، خۆ من پێشەوەری ژن سیفەت نیم، وڵات و میللەتەکەم بەجێ بهێڵم و هەلێم! !

سەرهەنگ عەتا، لە ترسی ئەوەی قازی محەمەد دووبارە تووڕە نەبێتەوە و وەك نیکۆزاد ئەویش ریسوا نەکا، بە پەلە داوای لێبوردنی کرد و سوێندی خوارد کە مەبەستی ئیهانەکردنی نەبووە، بەڵکو قسەیەك بووە وا هاتووە.

قازی محەمەد گوتی:

ئەگەر قسەیەکم گوتبێ و ئێوە پێتان خۆش بووە، ئەوە دیارە زۆریانم پێچەوانە پێ گوتوون، دەنا یەقینەن ئەوەی گوتوومە، هەمووی وایە.

یەکەم، لە بەر ئەو پەیمان و بەڵێنانەم بوو کە گوتم، دووەمیش بۆ ئەوە بوو زیاتر لەوە خوێن نەڕژێ، بە تایبەت لە پێناوی مانەوەی من و من نیگەرانی کوشت و کوشتار بووم.

سەرهەنگ عەتا:

بە ڕاستی نیگەرانی خۆت بووی، یاخود بارزانییەکان، یاخود نیگەرانی سەربازانی ئێمە بوویت؟!

قازی محەمەد:

نەودڵلا، نە نیگەرانی خۆم بوو و نە نیگەرانی سەربازانی ئێودش، بەڵکو من نیگەرانی کوردەکان و لاوە بارزانییەکان بووم، دەنا من ئەوەدم بۆ خۆم داناوە و دەمزانی هەر دەکوژرێم و ئەمەیان ئاواتی منە.

سەرهەنگ عەتایی:

دەکرێ بڵێی بۆ ئەوەندە نیگەرانی بارزانییەکانی؟!

قازی محەمەد:

لەبەر چەند هۆیەك؟!

سەرهەنگ عەتا:

ئەو هۆیانە چین؟!

قازی محەمەد:

چونکە مەلا مستەفا و بارزانییەکان هیوای دوارۆژی میللەتی کوردن و منیش پەرچەمی کوردستانم بە ئەوان سپاردووە، ئەوان پارێزگاری لەو ئاڵا (پەرچەمە)یە دەکەن، تا رۆژی خۆی ئاڵای کوردستان لای ئەوانە، نەك ئەوەی کە سەرهەنگ نیکۆزاد تفی لێ کرد و پێی لە سەر دانا، هیوام بە خوایە

به بەڵێنی خۆم وەفام کرد و هیوادارم رووسووری دنیا و قیامەت بم لای خودا و لای میللەتەکەم.

پرسیار:

ئایا کاتێك تۆ زیندانی بووی، بارزانی لە دەرەوەی مەهاباد هیچ نەخشە و پلانێکی بۆ ڕزگارکردنت هەبوو، یان شتی تر؟

قازی محەمەد گوتی:

بەڵێ، بارزانی خەبەری دامێ کە هەر شەوێك دەڵێ، من دەتوانم ژمارەیەکی زۆر لە پێشمەرگەکانم بنێرم و بێنە ناو پادگان و بە هەر جۆرێك بێت لە بەندیخانە ڕزگارت بکەم. مەلا مستەفا زۆری مەبەست بوو لە بەندیخانە نەمێنمەوە و نەکوژرێم.

پرسیار:

ئەی بۆ چی ئەو کارەی نەکرد؟

وەڵام:

من خۆم نەمویست!

پرسیار:

لەبەرچی؟ بۆ چی ئامادە نەبووی ڕزگارت ببێ؟!

قازی محەمەد:

لە بەرچەند هۆیەك بوو.

سەرهەنگ عەتایی:

هۆیەکان چی بوون؟

قازی محەمەد:

مستەفا وێنەی ڕاستەقینەی ئێوەی عەجەمی بۆ کێشام و حاڵیی کردم کە ئێوە چۆنن و چین و کێن.

سەرهەنگ عەتا لێی پرسی:

دەکرێ بڵێی ئەو وێنەیەی لە ئێمەی بۆ کێشای چی بوو و چۆن بوو؟

قازی محەمەد گوتی:

بە ڕاستی بارزانی ئێوەی لە هەموو کەسێك باشتر ناسیوە، مەلا مستەفا پێی گوتم: هیچ گەل و میللەتێك وەك عەجەم نییە، عەجەم کاتێك دەسەڵاتی هەبوو لە خۆی بێ بەزەیی و بێ ویژدانتر و زاڵمتر نییە، بەڵام ئەگەر ژێردەست بوو، کەس ناتوانێ و نازانی وەك عەجەم خۆی زەلیل و مەزلووم بکا و بپاڕێتەوە. لە کاتی بەهێزیدا هەرچی لە دەسی دێ دەیکات و لە کاتی بێدەسەڵاتیشدا بە هەرچییەك خۆی دەرباز بکا، دەیکات و دەیڵێت، جا تۆ بە هیوای ئەوە مەبە کە تاوانێکت نەکردووە، عەجەم لێت خۆش ببێ.

دیسان سەرهەنگ عەتا پرسی:

پەشیمان نیت کە لە گەڵی نەڕۆیشتی؟

قازی محەمەد وەڵامی دایەوە و گوتی:

ئەگەر خوای گەورە ئەو شێوە مەرگەم بە خۆبەهیلاکدان بۆ دانەنێ، نا.. هەرگیز پەشیمان نیم، چونکە بەڵێنم بە میللەتی کورد دابوو لە گەڵی بژیم و لە پێناویدا بمرم. دەزانم ئەگەر من ڕۆیبام و ئەمنتان نەکەوتایە بەردەست، دڵنیام کەسانی زۆرتان لە خەڵکی مەهاباد و میللەتی کورد بە تۆڵەی من دەکوشت، جا بۆیە خۆشحاڵم بەوەی یەکەم من بێتاوان دەکوژرێم، دووەمیش،

شیعرێکی زۆر بە واتا و بەرز و گەرمی خوێندەوە کە بە فارسی بوو و رەگ و ریشەی عەجەم و شیعەی دەردەهێنا.

حەزم دەکرد ئەو شیعرە بنووسمەوە و بزانم شیعری کێیە، بەڵام کات کاتی دادگە بوو، نەمتوانی شیعرەکەی پێ دووبارە بکەمەوە. لە دوای خوێندنەوەی شیعرەکە قازی محەمەد گوتی:

ئاوا پیشانی ئێمەیان داوە و ئێوەیان پێ ناساندووین.

قازی محەمەد گوتی:

هەزار رەحمەتیان لێ بێ.

دیسان سەرهەنگ عەتا پرسیاری لە قازی محەمەد کرد:

لەو کاتەوەی مەلا مستەفا بارزانی لەو ناوە رۆیشتووە، ئایا هیچ پەیوەندیەکتان لە گەڵیدا هەبووە، ئەگەر بووە لە چ رۆژێکدا و چۆن بووە؟

قازی محەمەد گوتی:

تا بارزانی گەیشتە دەوروبەری شنۆ و نەغەدە پەیوەندیمان پێکەوە هەبوو، بەڵام لەوەتەی ئەو دوور کەوتۆتەوە، هیچ پەیوەندیەکمان نەماوە و ئاگام لێی نییە.

دیسان لێیان پرسی:

ئایا دەکرێ بڵێی ئەو کاتەی لە گەڵ مەلا مستەفا پەیوەندیت هەبوو، مەلا مستەفا چی پێ رادەسپاردی، چی نەخشەیەکی بۆ رزگارکردنی تۆ هەبوو؟

لە وەڵامدا قازی محەمەد گوتی:

مەلا مستەفا بارزانی زۆر هەوڵی دا لە گەڵی بچم، تا نەخرابوومە بەندیخانەوە پێی گوتم کە من دڵ بە بێتاوانیی خۆم خۆش نەکەم، مەلا

پیرمردی زنرح می نالیدپ یرزن صندلیش هم می مالید.

سەروان کیۆمەرس ساڵح دوای خانەنشینبوونی لە ژێرنووسی گۆڤارێکی دیکەدا دەڵێ:

من لە زۆربەی دادگاکانی مەیدانیی و سەربازیی و بەدەویدا وەك هەواڵنێر بەشداریم کردووە، ئەو کاتەی کە هەواڵنێری (ماه نامه)ی ئەرتەش بووم، بەڵام هیچ کەسێکم بە ڕاددەی قازی محەمەد بە جەرگ و بوێر نەدیوە، هەرگیز لە کاتی دادگەییکردنیدا نەترسا بوو و زۆر بە بێباکی قسەی دەکرد و وەڵامی پرسیاردکانی دەدایەوە، وەك ئەوی لە کۆڕی جەژن و داوەتێکدا دانیشتبێ، وابوو.

هەر لە سەروبەندی دادگەییکردنی قازی محەمەد بۆ جاری دووەمدا، کیۆمەرس لەماهنامەکەیدا دەنووسێ:

تەواوی هەلومەرج و دادگەییکردنەکەم وەکوو خۆی نووسیوە، دیارە هەر بەو هۆیەشەوە بووە بە تاوانی ئاشکراکردنی نهێنیی لەشکری و دژە ئەمنییەتبوون (ماەنامەکەیان) بڵاو نەکردۆتەوە و سەروان کیۆمەرس ساڵحیان دادگایی کردووە.

لە درێژەی نوسینەکەیدا سەروان کیۆمەرس دەنووسێ:

کاتێك سەرهەنگ نیکۆزاد ئیهانەی بە قازی محەمەد و گەلی کورد کرد و قازی محەمەدیش زۆر بە توندی وەڵامی دایەوە، قازی محەمەد گوتی:

پێشینانی ئێمە ئێودیان زۆر باشتر لە ئێمە ناسیبوو، یاخوا خودا لەو شاعیرە خۆش بێ کە گوتوویەتی.

سەروان کیۆمەرس ساڵح دەڵێ:

قازی محەمەد گوتی: من ئەو مافە بە کەس نادەم ئیهانە بە گەلەکەم بکات و ئێستاش من لە پێناوی ئەو میللەتەدا حوکمی لەسێدارەدانم پێ دراوە، تازە من بە خاتری چی ئامادە بم ئیهانەی هەر خوێڕی و ناپیاوێك قبووڵ بکەم و من تەنیا (مقابەلە بتلتل)م کردەوە و وەڵامی ئەوم داوەتەوە نە زیاتر، ئەمە کاری خوایە کە دەبێ بێ سەروپێیەك بێت و ئیهانە بە میللەتی کورد بکات، ئەمە لێهاتوویی و لێزانیی ئێوە نیە. ئینجا من چیم دەوێ تا قبووڵی هەر بێحورمەتیەك بکەم، هەروەکوو سەعدی دەڵێ:

هر انکس دست از جان بشوید، هرانچە در دل دارد بگوید

ئەگەر من بە بێنازەکەتیم نەزانیبا، زۆری دیکەم لە دڵدا بوو پێی بڵێم، تازە ئەوەی من داوام بوو لە خوا، خوا پێی داوم، واتە مەرگ و شەهیدبوون لە پێناوی ئایین و گەلەکەمدا و هیوادارم بە روویەکی سوورەوە بچم بۆ بارەگای خوای گەورە و مێهرەبان. لە کۆتایی ئەو دادگەیەدا، ئەو تاوانەشیان خستە پاڵ قازی محەمەد کە گوایە ئەم دێرە شێعرە:

(اگر سراسر پشت بر دشمن دهیم .. از ان بە کە یکی بە کشتن دهیم)ی بۆ کۆمەڵێك ئەفسەر و کادیری کۆمار خوێندۆتەوە و ئەوانیش کردوویانە بە دروشمی خۆیان، بەڵام قازی محەمەد لە وەڵامدا گوتی:

جاری یەکەمە من ئەو شیعرە دەبیستم.

دوایی دادستان خۆی گوتی:

نانا، ئەو شیعرە سەدری قازی ئەبولقاسم سەدری قازی گوتوویەتی و قازی محەمەد شیعری دیکەی بەرانبەر هێزی چەکداری کۆماری کوردستان گوتووە و گوتوویەتی: (ئەرتەش و حکوومەتی ئێران) وەك دێرە شیعری:

نە من و نە کەس ناتوانێ بارزانی وەك خۆی بە ئێوە بناسێنێ، حەز دەکەم لەو باسە بگەڕێین.

بەڵام دیسان داوایان لێ کرد ئەو باسەیان بۆ بکات. قازی محەمەد گوتی:

باشە، بەڵام تەنیا لە چەند رستەیەکدا دەتوانم بڵێم مەلا مستەفا بارزانی ئەوەی لە پیاوەتی و کەرامەت و شەرافەت و ئینسانیەت و شەجاعەت و نەبەزیی و سەخاوەت و پیاوەتی و نەترسیی لە مێژوودا کەسانی مەزن بوونبێتیان، مەلا مستەفاش هەیەتی، ئەوەی موسڵمانانی سەدری ئیسلام لە باوەڕ و راستی و پاکی و دڵسۆزیی بۆ خوا و ئایین و خەڵکی هەژار و داماوی میللەت بوویانە بارزانی هەموو ئەوانەی تێدایە، هەر وەکوو سەعدی دەڵێ:

هرانچە خوبان همە دارند او بە تنها دارد.

جا حەز دەکەن باوەڕ بکەن و پێتان خۆش بێ یا حەز دەکەن پێتان ناخۆش بێ.

هەموو ئەوانەی لە دادگەکەدا بەرهەڤ بوون، سەریان لەو تاریفەی قازی محەمەد سوڕ ما. قازی محەمەد دیاربوو هەموو ئەو قسانەی لە ناخی دڵیەوە بە باوەڕەوە دەگوت و هیچ شك و گومان لەوەدا نەبوو ئەو تاریفانەی کە لە مەلا مستەفای کردن، نە بە خاتری دڵخۆشیی مەلا مستەفا بوو، نە بە خاتری دەستەی دادگە.

عەتایی لێی پرسی:

ئەو هەموو تووڕەییەتان لە جەنابی سەرهەنگ نیکۆزاد چی بوو، چونکە ئێمە بیستوومانە لەم وڵاتەدا کەس بە ڕاددەی تۆ لە سەرخۆ و ئارام و هێمن نیە.

قازی محەمەد گوتی:
لە مەلا مستەفا بارزانی بگەڕێ، تۆ خۆت گوتت کە مەلا مستەفا کەسێکی بیانییە کە ئەمە لە دەرەوەی ئیشوکاری دادگەیە.
بەڵام دیسان سەرهەنگ داوای لێ کردووە.
قازی محەمەد گوتی:
ئەگەر بە تەواوی باسی مەلا مستەفات بۆ بکەم، لەوانەیە بڵێی لایەنگری و خۆشەویستی و دەمارگرژیی کوردانە گرتوویەتی..

سەرهەنگ عەتا سوێندی بۆ خوارد کە من بڕوام بە ڕاستگۆیی تۆ هەیە، هەر لەو دادگایەدا بۆم ڕوون بۆتەوە کە هەرچی گوتووتە و دەڵێی، لە ناخی دڵتەوەیە و بە باوەڕەوە گوتووتە.

ئینجا قازی محەمەدە گوتی :
من ناتوانم هەموو تایبەتمەندییەکانی بارزانی بۆ ئێوە باس بکەم، ئێوەش هەرگیز ناتوانن بارزانی بە تەواوی بناسن، ئەگەر منیش بڵێم، ئێوە هەرگیز پەسەندی ناکەن کە دوژمنتان بەو هەموو کردەوە و تایبەتمەندییە باش و جوانانەوە بناسن و لە ڕیزی دوژمنایەتیی ئێوەشدا بێ.

دادستان هەڵی دایێ و داوای لێ کرد کە بە ڕاددەی زانیاریی خۆی ، مەلا مسەفایان پێ بناسێنێ، هەرچی لە بارەیەوە دەیزانێ بیلێ.

قازی محەمەد دیسان پێی لە سەر ئەوە دادەگرت و گوتی:

کاتەدا دیسان سەرهەنگ نیکۆزاد، کە دادستان بوو و قازی محەمەد زۆر بە توندی لە بەرامبەری وەستابوو، وەکوو مار خۆی دەخواردەوە، پارچە قوماشێکی لە جانتاکەی دەرهێنا کە رەنگی سوور و سپی و سەوز بوو، چەکوش و داسێکی لە سەر کێشرا بوو و بە قازی محەمەدی گوت:
ئەی هەموو حکوومەت و پەرچەم و تەشکیلاتت ئەوە نیە؟!! سەرهەنگ تفێکی لە ئالاّ کە کرد و خستیە بەر پێی و پێی لێ نا؟! قازی محەمەد لە بەرامبەر ئەو کردەوەی سەرهەنگدا گوتی:
جارێ ئەمە هەرگیز ئالاّی کوردستان نیە و نەبووە، چونکە ئالاّی ئێمە چەکوش و داسی تێدا نیە، پاشان ئەم هەڵسەکەوتەتان نیشانەی کەم عاقڵی و بێ شعووریی تۆ دەگەیەنێ، دڵنیا بن ئێوە دستتان بە ئالاّی کوردستان ناگات بێ حورمەتی پێ بکەن، رۆژێکیش دێت لە سەر ئەو خانووەی کە منی تێدا دادگایی دەکرێ هەڵ دەدرێ و دەشەکێتەوە.
ئالاّی کوردستانم وا بە مەلا مستەفای بارزانی سپاردووە و لە سەر شانی ئەو، لەو چیا بۆ ئەو چیا و لەو شار بۆ ئەو شار و لەو ولاّتە بۆ ئەو ولاّتەی دەبا، تا رۆژێك لە تەواوی بەرزایی و بلندایيەکانی کوردستان هەڵ دەدرێ و دەشەکێتەوە، دڵنیا بن ئەو رۆژە دێ.
ئینجا سەرهەنگ داوای لە قازی محەمەد کرد کە هەرچەند ئەم بابەتە لە دەردوەی بەرنامەی ئیشوکاری دادگەیە، بەلاّم ئەگەر بکرێ هەندێ تایبەتمەندی و خۆڕەوشتی مەلا مستەفا بارزانییان بۆ باس بکات، چ وەك بیر و باوەڕ و بۆچوونی خۆی، یان وەك خۆڕەوشت و ئاکاری خودی بارزانی، بە بێ دەمارگرژی.

پرسیارەکان دووبارە لە یەکەمەوە دەست پێ کرایەوە، قازی محەمەدیش کە هەموو ئەوانی رەت کردبوونەوە، دیسان رەتی کردنەوە، لە وەڵامی پرسیاری ئەوەی کە بۆچی بە بێ ئاخاوتن لە گەڵ حکوومەتی ناوەندی، گرێبەندی بازرگانی نەوتتان لە گەڵ حکوومەتی رووسیادا بەستووە، قازی محەمەد پێکەنی و گوتی:

کامە نەوت، ئێمە کام بیر و کۆمپانیای نەوتمان لە بەر دەستدا بووە تا بازرگانی پێوە بکەین، سەیرە، ئەگەر ئێوە دەتانەوێ بە ناڕەوا تاوانمان بدەنە پاڵ. تاوان و بوختانێکمان بۆ دروست بکەن، کە لانی کەم وێ بچێ. رەنگە ئێوە ئاوی ئەم رووبارە کە بە ناو شاری مەهاباد دا ردد دەبێ بە نەوت بزانن، بە راستی ئێوە زۆر نەزانانە و بێ سەروبەرانە ئەو هەموو تاوانەتان بۆ هەڵبەستووین کە هیچ کامیان بناغەیان نیە.

هەروەها لە وەڵامی ئەو پرسیارەی کە گوایە قازی محەمەد رێگەی داوە، یاخود داوای لە بێگانە کردوە بێتە ناو خاکی ئێرانەوە، وەك مەلا مستەفا، قازی محەمەد هەروەك سێ مانگ بەر لە ئێستا وەڵامی ئەم پرسیارەی دایەوە و گوتی:

مەلا مستەفا لە کوردستان بێگانە نەبووە و نیە، کوردستان ماڵی هەر کوردێکە و کەس ئەوی نەهێناوە، بارودۆخ وای کردووە کە ئەو بۆ بەشێکی دیکە لە ماڵی خۆی بێت، واتە لە بەشێکی ماڵەکەی خۆیەوە، هاتووە بۆ بەشێکی دیکەی ماڵی خۆی و وەسەللام.

ئەوجا سەرهەنگ عەتایی یەکە یەکە پرسیارەکانی دووبارە پرسییەوە و قازی محەمەدیش هەروەك پێشتر هەموو تاوانەکانی دووبارە رەت کردنەوە، لەو

بە ڕەحمەت لە لایەن خوداوە بۆ خۆم دەزانم. شانازی بەو مەرگ و مردنە مەردانەیە دەکەم.

دوای تەواو بوونی قسەکانی، قازی محەمەد بڕیاری دا ئیتر هیچ قسەیەك نەکات و وەڵامی هیچ پرسیارێکی دیکەی دادگە نەداتەوە. قازی سوێندی خوارد وەڵام نەداتەوە و گوتی:

ئەم نامەردە هەر غەڵەتێکی دەیکا با بیکا.

دادستانیش بۆ ئەوەی قازی محەمەد بێتەوە سەرخۆی و بەڵکوو لە بڕیارەکەی پاشگەز بێتەوە، کاتی پشوودانی دادگەی ڕاگەیاند و دوای پشوودان زۆریان هەوڵ و تەقەللا دا کە وەڵامی پرسیارەکانی دادستان سەرهەنگ نیکۆزاد بداتەوە، بەڵام قازی محەمەد گوتی:

ئێستا کە بڕیار وایە من لە سێدارە بدرێم، ئەمە بە خاتری ئەو سۆز و بەڵێنەیە کە من بە میللەتەکەم داوە، بڕیارم داوە لە گەڵ میللەتەکەمدا بژیم و بۆ ئەو بمرم، تازە چۆن ئامادەم بەڵێنی خۆم و سوێندێك کە خواردوومە بشکێنم، بە هۆی ئەو هەموو بێ شەرەفییەی سەرهەنگ کە خۆی کردووە بە دادستان، من ئامادە نیم وەڵامی ئەو کەسە بدەمەوە، مەگەر کەسێکی دیکە پرسیارم لێ بکات.

کاتێك ڕوون بووەوە کە قازی محەمەد ئامادە نیە قسە بکات، دەستەی دادگە لە نێوان خۆیاندا کەوتنە ڕاگۆڕینەوە، ناچار بڕیاریان دا لە شوێنی سەرهەنگ نیکۆزاد، سەرهەنگ ڕەجب عەتایی کە سەرۆکی دادگە بوو، بوو بە دادستانی دادگەکە.

بە هۆی پێداگریی قازی محەمەد لە سەر ڕەتکردنەوەی تاوانەکانی دادگە، دادستان بە سەر قازیدا نەڕاندی و زۆر بە تووڕەیی قسەی لە گەڵ کرد، قازی محەمەدیش کاردانەوەی بە تووڕەبوونی خۆی نیشان دا و بە زمانی فارسی بە دادستانی گوت:

شما هم خورده دسیگران را نشخوار میکنید.

هەروەها پێی گوت:

شما اگر دین ندارید و خدا را هم نمیشناسید و ایمان به حساب و کتاب اخرت ندارید، لااقل زرەای جوانمرد باشید.

پێی گوت:

ئەم جۆرە درۆ و بوختانەتان چۆن بۆ من دروست کردووە، ئەگەر ڕاست دەکەن بەڵگە بخەنە ڕوو.

لەبەر ئەوەی ئەم قسانە لە ناو فارساندا ئیهانەیەکی گەورەیە، بۆیە بەو قسانەی قازی دادستان زۆرتر تووڕە بوو، تاکوو بە مستیش لە سەری خۆی دا و بە قازی محەمەدی گوت:

کوردان سەگ سفەت؟! بەڵام تووڕەیی و هەڕەشەی دادستان کاری لە قازی نەکرد، بەڵکوو بە پێچەوانەوە زیاتر بە ڕووی دادستاندا هەڵپڕژا و پێی گوت:

سەگ و بێ شەرەف و بێ ئابڕوو ئێوەن، کە هیچ سنوورێك بۆ خۆتان و بۆ خەڵك و یاسا دانانێن، ئاخر بێ شەردف، تۆ هەر دەتوانی بڕیارێك کە ئەو بێ شەرەفەی دیکە داویەتی جێبەجێی بکەی، لەوە زیاتر هیچ هەڵەیەکی دیکەت لە دەست نایە، من لە زووەوە خۆم بۆ ئەوە ئامادە کردووە و بە باوەشی ئاواڵاوە ئەوەی کە بێ تاوانم و لە ڕێی ئازادیی میللەتەکەمدا دەکوژرێم، ئەمە

بەرگریکردن و سەلماندنی بێتاوانیی خۆیان ئامادەیان کردبوو دڵنیا بوون، بەڵام دیار بوو بڕیاری تاوانبارکردنیان هەر لە تارانەوە دەرچوو بوو.
تاوانباران وایان بیر دەکردەوە کە هەر یەکەیان لەوانەیە چەند ساڵێك بەند بکرێن، بەڵام وا دەرنەچوو.
لە درێژەی نووسینەکەیدا کیۆمەرس دەنووسێ:
دەستەی پێداچوونەوە و دادگاییکردنەوەی قازییەکان لە لایەن ستاد (فەرماندەیی) لەشکرییەوە دەستنیشان کران و بە شای ئێرانیش ناسێندران. شاهەنشا هەندێ ئامۆژگاری و راسپاردەی کردن کە بە هیچ شێوەیەك نابێ شك و گومان لە دادگا بکەن و بەردەوام پێوەندیی بێتەلیان لە گەڵ ستادی ئەرتەشدا هەبێت.
دەستەی دیایکراوی دادگا لە رۆژی ١٩٤٧/٣/٢٥ لە تارانەوە بەرەو تەورێز و لە وێوە بۆ میاندواو و مەهاباد وەڕێ کەوتین، رۆژی (١٩٤٧/٣/٢٨) گەیشتینە شوێنی مەبەست و شەوێك لە پادگانی مەهاباد پشوومان دا. بەیانی دادگە دەستی پێ کرد، سەرەتا قازی محەمەدیان هێنا و دەست کرا بە پرسیار لێ کردنی، تاوانەکانی هەمان ئەو دوازدە ماددەیەی پێشوو بوون کە لە لایەن دادگەی سەربازیی مەیدانییەوە جاری پێشتر رووبەڕووی کرابوونەوە و قازی محەمەدیش جگە لە سێیانیان نەبێت، هەموو ئەوانی دیکەی بە توندی رەت کردنەوە. قازی محەمەد دووبارە بۆ سەلماندنی تاوانەکانی دادگە، داوای بەلگەی دەکرد. لە تەواوی کاتی خوێندنەوەی تاوانەکان و بەرگری لەخۆکردنیدا، قازی محەمەد زۆر ئارام و لەسەرەخۆ بوو، زۆر بە رێز و بە هێمنییەوە وەڵامی پرسیارەکانی دەدایەوە.

دووباره دادگایی کردنەوەی قازییەکان

دوای تێپەڕبوونی نزیکەی ماوەی سێ مانگ بە سەر دادگاییکردنی قازییەکاندا، ئینجا لە ستادی ئەرتەشی ئێران دەستەیەك بۆ دووباره دادگاییکردنەوەی قازییەکان لەمانەی خوارەوە دەستنیشان کرا:

سەرهەنگ رەزا نیکۆزادە (دادستان)

سەرهەنگ رەجەب عەتا (سەرۆکی دادگای پێداچوونەوە)

سەروان حوسێن سولحجوو (ئەندام)

سەروان نەبەوی، وەك پارێزەر بۆ قازییەکان دەستنیشان کرابوو

لێرەدا هەواڵنێر کیۆمەرس دەنووسێ:

لە گەڵ ئەوەی کە تاوانبارەکان (قازییەکان) بە وردی بەرگریکردن و رەتدانەوەی خۆیان بۆ ئەو تاوانانە لە ١١٤ لاپەرەدا لە دانیشتنی یەکەمدا بە دادگای پێداچوونەوە دابوو و داوای سەلماندنیان کردبوو، بەڵام داواکەیان بۆ ماوەی نزیکەی سێ مانگ لە دادگای مەیدانیی ستادی ئەرتەش دانرابوو، چۆن لە مەهاباد داخرابوو و مۆر کرابوو، هەر بەو شێوەیە مابووەوە و هیچ کەس ئامادە نەبوو تەنیا بیشیکاتەوە، یاخود بیخوێنێتەوە.

هەروەها لە کاتی هاتنی دەستەی دادگایی لە تارانەوە بۆ مەهاباد ئەم داواکارییەی بەرگریکرن لە گەڵ خۆیان بۆ نەهێنابوون، تا لانی کەم لە کاتی دادگاییکردنی دووبارەشیاندا هەر تەنانەت پێیان بڵێن ئەوانەمان قبووڵ نیە. ئەگەرچی تاوانباران (قازییەکان) زۆر لە خۆیان و لەو نووسراوەی بۆ

بەشارەتهێنەری ئەم هەرد و شار و دەشتەی
گەلم بێ تۆ هەتیو و پەرێشان و وەڕەز بوو
مەلی بێ پەڕ و باڵ و گرفتاری قەفەس بوو
بە تۆ گەشاوە روخساری پڕ چرچ و چرووکم
بە تۆ رزگار و ژیاوە گەلی مەهتووك و سووکم
کوردم و لەو خاکە بوومە بەو ناوە ژیاوم
بۆ ئازادیی گەل و رزگاریی نیشتیمانم نەماوم
من بە رووت و قووتی و پێخواس و بێ کراسی
لە ماڵی خۆما دوژمن بە سەربارم دەناسی
مەقدەمی خێرت لای برد غەمی زۆرم لە سەر شان
بە تۆ سارێژ بوو تەنی پڕ زام و حاڵی پەرێشان
زامی دەردی کوردانم پڕ ژان و لە مێژە
دەرمانی دەردی موزمین و دوور و درێژە
سەروەر مستەفایە بۆ موحەمەد پشتیوانە و برایە
یارەب شوعلەوەر کەی ئەو دوو چرایە
یا رەب بە فەزل و فەیزی خۆت و نووری ئیمان
موەففەق کە موحەمەد، هەم مستەفا را ب خاتری قورئان
فەخری گەل مستەفا و بارزان مایەی شانازی
فیداتە گیان و سەر و ماڵی سەدری قازی
ئەوی بارزان وا ئەناسێ بێ هۆشی بێ زمانە
کەر و گێژ و وێژ و حەیوان و نەزانە
ئەوەی ناحەزی بارزانە جاش و خۆفرۆشە یانی
گەواد بابە و زۆڵە کوردە و دایکی زانی

بێی تۆ گەل و نیشتیمانم بێ خێو و دیلە
ژێر چەپۆکی دوژمن و زەرد و مات و زەلیلە
دڵی دوژمن لە ترسی هەڵمەتت دێتە لەرزە
نیە دوژمن بەرەنگارەت لەم کوڕەی ئەرزە
بە تۆ ناسرا گەل و نیشتیمانی کوردەواری
ئەتۆی بەرز و بارێز لە هەر لایە دیاری
بێی تۆ گە دوژمن بە سەر نیشتیماندا زاڵە
بێی تۆ گەل وەك کەلی زامدار بێ پەڕ و باڵە
تۆ مەردی مەیدان و نەبەرد و رۆڵەی
واریسی پیرۆزی ئیرسی بارزان و تۆڵەی
بە مێژوو خاوەن نیشتیمان و گەل و خێوی
بە بەرزیت بازی بارزان و لوتکەی کێوی
لای دوژمن باریز و ناوبانگی بە ناوان
بە بیستنی ناوت دوژمن چرکە میزە دەگرێ لە تاوان
بە بارزانم دەنازم، ئەقدەسی رووی زەمینە
بێشەی شێر و ئاوەکەی مایەی ژینە
لە تۆ فێربوون بە دەردی بێبەشان ئاشنایی
بە تۆ بوو شەوی بەختڕەشان رەوشەنایی
بێ تۆیە ئەم نیشتیمانە دەکەن بەشبەش و دابەش
بەم بەش و پرش و پەرێشانە بوو بێبەش
هەر تۆ بۆ نیشتیمان غەمخۆر و پڕ مشووری
فەرامۆشت نەکرد لە کاتی غوربەت و دووری
تۆ بۆ گەل و نیشیتمان موژدە و هەم فریشتەی

له سەر وردەکارییەکانی بەڕێوەچوونی دادگاکە کیۆمەرس ساڵح دەنووسێ:
دانیشتنی دادگە نزیکەی چوار سەعاتی خایاند و دەستەی دادگەکە دوای نیو کاتژمێر پرس و راگۆڕینەوە، بڕیاری لەسێدارەدانیان دا و بە هۆی بێتەلەوە بە ستادی ئەرتەش کە ئەوکات سپەهبود ئەرشەد هومایوونی سەرۆکی ستاد بوو و ژەنەراڵ ناجوودانی شا لە دەربار و سەرهەنگ فەتحوڵڵا مین باشیان، پێوەندیان کرد و لەوێوە بڕیاری گەڕانەوەی تارانیان وەرگرت. هەر ئەو شەوە بە ڕێگەی میاندواودوە گەڕانەوە تاران.
ئەو شیعرەی کە ئەبولقاسم سەدری قازی پێ تاوانبار کرا هەر بە کوردی لە ژمارە (٦٦)ی ماهنامە - مسلسل ١٥٣ دا بڵاو کراوەتەوە، بەڵام لە گەڵ تێکەڵیی هەندێ وشە و هەڵەی چاپی ئەویش، چونکە سەروان کیۆمەرس ساڵح کوردی نەزانیوە و دیارە ئەوەی تایپیشی کردووە هەر کوردی نەزانیوە تا بتوانن فۆنەتیکی شیعرەکە بە جوانی بنووسنەوە و چاپی بکەن. پێویستە ئاماژە بەوەش بکەم کە هەر لەو گۆڤارەدا، لە ویژەنامەکەی تاج کیان - یش دا زۆر بابەتی گرنگ و بە پێز لە بارەی کۆماری کوردستان و بزاڤ و چالاکییە هونەری و ئەدەبییەکانی ئەو کاتی مەهابادەوە بڵاو کراونەتەوە.
ئەمەش دەقی ئەو شیعرەیە کە بووە بەندی یەکەمی تاوانباربوون و لەسێدارەدانی سەدری قازی:

یاخوا بە خێر بێی لاوی هەڵۆی بەرزەفڕی بارزانەکەم
رەمزی پیرۆزی گەل و نیشتیمانەکەم
بارزانی دوژمنشکێنی، شێری ژیانەکەم
پێت لە سەر چاو و قەزات لە ماڵ و گیانەکەم

تاوانەكانی سەیفی قازی یان موحەممەد حوسێن خانی قازی ، وەزیری جەنگ و جێگری سەرۆك كۆماری كوردستان قازی محەممەد:

چوونی دەرەوەی وڵات، باكۆ پایتەختی ئازەربایجانی رووسیا.

پێوەندیكردن بە پیشەوەری سەرۆك كۆماری ئازەربایخجانی ئێران لە تەورێز و كۆبوونەوە لە گەڵیدا و پەیمان بەستن لە گەڵ هەردوو سەرۆك كۆماری ئازەربایجانی رووسیا و ئازەربایجانی ئێران، واتە لە گەڵ پیشەوەری و باقرۆف گە ئەویش پەیمانێكی سێكوچكەیی سەربازیی بووە.

وەرگرتنی وەزارەتی جەنگ لە كۆماری كوردستان لە دژی حكوومەتی ئێران.

تاوانەكانی سەدری قازی، یان ئەبولقاسم سەدری قازی كە بە نوێنەری دەورەی (١٤)ی مەجلسی شۆرای مللیی ئێران لە لایەن خەڵكی كوردەوە لە بەشی مەهاباد و دەوروپشتی ئەو شارە هەڵبژێردرابوو

نووسینی شێعرێكی حەماسیی گەرم بۆ مەلا مستەفای بارزانی و بەو شیعرە بەخێرهێنان و پێهەڵگوتنی وەكوو رەمزی پیرۆزی گەلی كورد.

هاوكاریكردنی قازی محەممەد و وەزیرانی كۆماری كوردستان و حكوومەتەكەیان و دانانی رێوشوێنی حكوومەتداری و دامەزراندنی كاروباری حكوومەتداری لە مەهاباد.

نووسینی نامەیەك بۆ قازی محەممەد كە تیایدا نووسیویەتی: خۆتان راگرن تا لە دەرەو كۆمەكتان پێ دەگات.

هاندانی خەڵك لە دژی حكوومەتی ئێران و دڵنیاكردنی بەرپرسانی كۆماری كوردستان لە مەهاباد بەوەی كە تازە دەوڵەتی ئێران تاوانێ شەڕ لە گەڵ كۆماری كوردستاندا بكات.

ناردن و هاتوچۆ بۆ دەردودی ولات و سەردانی رووسیا و دانیشتن و کۆبوونەوە لە گەلّ (باقرۆف)ی سەرۆك کۆماری ئازەربایجانی رووسیا.
گرێدانی پەیماننامە و گرێبەندی بازرگانی بە بێ پرس و رای تاران لە گەلّ بێگانە و ناحەزانی ئێران.
گرتن و کوشتنی کارمەندانی میری و رووخاندنی خانووەکانیان و سووتاندنی ماڵەکانیان بە تایبەتی کارمەندە غەیرە کوردەکان.
نووسەر و پەیامنێری ماهنامە لە درێژەی گێڕانەوەکەیدا دەنووسێ:
قازی محەمەد زۆر بە توندی هەموو ئەو تاوانانەی رەت دەکردەوە تەنیا سێیانیان نەبێت، ئەوانیش:
چوونی باکۆی ئازەربایجان و چاوپێکەوتن لە گەلّ جەعفەر باقرۆف.
بوونی ئالاّ بەلاّم نەوەك ئەوان بۆی چوون کە چەکوچ و داسی لە شێوەی پەرچەمی رووسیا لە سەر بووبێ.
هاتنی مەلا مستەفای بارزانی بۆ مەهاباد، ئەویش نەك کەس هێنابێتی، بەلّکوو خۆی هاتووە، چونکە ئەو کوردە و کوردستان ماڵی هەموو کوردێکە و هەر کوردێك حەز بکا لە هەر بستە خاکێکی خۆیدا بژی، هەقی خۆیەتی، چونکە ماڵی خاوەن ماڵە.

تاوانەکانی قازی محەمەد کە بە هۆی ئەمانەوە بڕیاری لەسێدارەدانی دەرچوو:

بازرگانیکردنی نەوت لە گەڵ دەوڵەتی رووسیا بە بڕی ٥١٪ بۆ دەوڵەتی رووس و ٤٩٪ بۆ کۆماری کوردستان بە بێ ئاگاداری و رەزامەندیی دەوڵەتی ناوەندی.

گۆڕین و دەستکاریکردنی نەخشەی وڵاتی ئێران و جیاکردنەوەی پێنج شاری ورمێ، کرمانشا، سنە، تەورێز و ئیلام.

دانان و دروستکردنی ئاڵا بۆ کۆماری کوردستان بە ئارمی چەکوچ و داس لە سەر شێوەی ئاڵای رووسیا.

لێدانی سکەی پوول (پارە) بۆ حکوومەتی کوردستان بە ناوی کوردستان و بە وێنەی رووپیەی رووسی و وێنەی قازی محەمەد.

سازکردنی نەخشەی کوردستانی گەورە هی هەر چوار پارچەی کوردستانی ئێران، عێراق، تورکیا و سووریا.

هێنانی بێگانە بۆ ئێران و خستنەژێردەستی بەشێك لە خاکی ئێران بۆ نموونە مەلا مستەفای بارزانی.

هەڕەشەکردن لە شاهەنشای ئێران و دەوڵەتی ئێران و راگەیاندنی شەڕ و هاندانی خەڵکی کوردستان لە دژی شاهەنشا ئاریا مێهر.

پەیمان و بەڵێنبەستن لە گەڵ حکوومەتی رووسیا لە دژی حکوومەتی ئێران و هاوکاریی هێزەکانی داگیرکەری رووسیا لە تەواوی خاکی ئێراندا.

راگەیاندنی سەربەخۆیی حکوومەتی کوردستان و داگیرکردنی بەشێکی گەورە لە خاکی ئێران بە ناوی خاکی کوردستانەوە.

منیش له تەواوی دانیشتن و کۆبوونەوەکانی دادگاییکردنەکان ئامادە بووم، دانیشتنەکانی دادگە چەند سەعاتێکیان درێژە دەبوو، پرسیار و تاوانەکان لە لایەن دادستان حەسەن کووفانیانەوە دەخرانە روو، دەتوانم بڵێم پرسیارەکان رۆشن و روون نەبوون.

بەشی زۆربەی تاوانەکان لە لایەن تاوانبارانەوە (قازییەکان) رەت کرانەوە و قازییەکان زۆر بوێرانە داوای هێنانەوەی بەڵگەیان دەکرد، بەڵام لە بەر ئەوەی پێشتر هەر لە تارانەوە تاوانەکان دەستنیشان کرابوون و هەر لە وێشەوە بڕیاری کۆتایی وەرگیرابوو، بڕیاریش وانەبوو هیچ بەڵگەیەك بۆ ئەو تاوانانە پێشکەش و پەسند بکرێ، بۆیە دانیشتنی دادگە وەك ریزبەندییەك دوای چەند کاتژمێرێك کۆتایی هات و دوای نیو کاتژمێریش بڕیاری لەسێدارەدانی قازییەکان پەسند کرا. لە راستیدا ئەو بڕیارە لە تاران درابوو و هەر ئەو شەوەش ئەو بڕیارە بە قازییەکان راگەیەنرا.

و جارجارەش لە گەڵ لەشکری کۆماری کوردستاندا تووشی شەڕ دەبوون، بڕیاری رووەو مەهابادبوونیان بۆ دەرچوو.

لەشکری تارانیان لە گەڵ هەندێ یەکەی دیکەی لەشکری ئێران لە تەورێزەوە بۆ گەیشتن بەو هێزانەی ناومان هێنان، لە رێگای قەزوینەوە بەرەو کوردستان نارد. ئەم هێزانە رۆژی (٢٠)ی مانگی سەرماوەز گەیشتنە سەقز و لە وێوە بە رێنمایی سەرۆك هۆزەکانی کوردی بە رێگای بۆکاندا بەرەو ناوەندی کۆمار (مەهاباد) وەڕێ کەوتن.

ئەم لەشکرە رۆژی (٢٩)ی سەرماوەز گەیشتە مەهاباد و زۆر بە پەلە ئەفسەرە تایبەتەکان کەوتنە شوێن قازی محەمەد و سەیف و سەدر.

ئەرتەشی ئێران لە پادگانە چووکەکەی مەهاباد دامەزرا و باروبنەی داکوتا، هەر ئەو شەوە بە رێگای بێتەلەوە پێوەندیان بە تارانەوە کرد و داوای چۆنیەتیی یەکلاکردنەوەی چارەنووسی قازییەکانیان کرد، قازییەکانیش لە سەربازخانەدا بەند کرابوون.

زۆر زوو لە تارانەوە فەرمان گەیشت کە لیژنەی دادگای مەیدانی پێك هاتووە و بۆ دادگاییکردنیان بەرەو مەهاباد بەڕێوەن.

رۆژی (٦)ی رێبەندان لیژنەی دادگا بە سەرۆکایەتیی سەرهەنگ غولام حوسێن عەزیمی و دادستان سەرهەنگ حەسەن کووفانیان و دادیاری سەرگورد جەعفەر سانعی و لە ژێر چاودێریی سەرهەنگ ئەمیر هۆشەنگ خەلعەتبەری گەیشتنە مەهاباد و کۆبوونەوەی دادگاییکردنی قازییەکان دەستی پێ کرد.

سەروان کیۆمەرس دەڵێ:

بەجێ بگەیەنین. هەر بۆ ئەوەی دەرباری شاهەنشا لە دڵسۆزی و گوێ بە فەرمانیی خۆی دڵنیا بکاتەوە، دوو کوڕی خۆی بە ناوی قادر و لەزگین بۆ لای شاهەنشا ناردووەتە تاران تا لە کاتی هاتنی ئەرتەشی ئێران بۆ کوردستان بە تایبەت بۆ مەهاباد ڕێنوێنیی ئەرتەش بکەن و ببن بە چاوساخیان.

جگە لە عومەرخان، زۆربەی سەرۆك هۆز و سەرۆك خێڵە کوردەکانی دیکەش بۆ دڵنیایی و ڕێنمایی ئەرتەش و ئیسپاتی ئاڵقەلەگوێیی خۆیان بۆ دەربار، کوڕ و برا و کەسانی دڵسۆزی خۆیان ڕەوانەی تاران کردبوو.

سەروان (کیۆمەرس ساڵح) دەنووسێ:

ڕۆژی (٢٧)ی ئەیلوول چەند یەکەیەکی لەشکری ئێران کە لە تۆپخانە و تیربار و چەند تانکێك (چەند کۆنە تانکێکی لەکارکەوتوو) لە تارانەوە بەرەو تەورێز وەڕێ کەوتن، سێ ڕۆژ دواتر واتە لە (٢٠)ی مانگ لە دەوروبەری شاری تەورێز دامەزران، بەڵام هەر بە بیستنی ئەم هەواڵە هەموو سەرانی حکوومەتەکەی ئازەربایجان بەردو رووسیا هەڵاتبوون و وڵاتیان بە جێ هێشتبوو، بەڵام ئەرتەشی ئێران بۆ دڵنیابوون لە زۆر شت، تا ڕۆژی دواتر واتە (٢١)ی مانگ خۆی لە چوونە ناو شاری تەورێز پاراست.

لێرەدا سەروان (کیۆمەرس ساڵح) دەنووسێ:

ئەو کاتەی دەست بە سەر شاری تەورێزدا گیرا، من بۆ ئامادەکردنی ژمارەیەکی نوێی مانگنامەکە گەڕامەوە تاران.

لە ڕۆژانی دواتر بڕیاری ڕووەو کوردستانبوون بۆ ئەرتەش دەرچوو، هەر بۆ ئەم مەبەستە ئەو چەند یەکە لەشکریەی کە هەر لە سەردەمی کۆماری کوردستانەوە لە سنە و کامیاران و دیواندەرە تا نزیك سەقز جێگیر کرابوون

بەگی بەگزادە و محەمەدەمین چەپی هەرکی و حەمزەی قادری مامەش و ئەوانی دیکی بۆ شای ئێران و دەربارەکەی، یان بڵاو کراوەتەوە، یاخود لە نامەخانەی ئەرتەشدا ئەرشیف کراوە. لە هەمووی سەیرتر پێوەندیی عومەرخانی شکاکە بە دەربارەوە کە لەو ماوەیەی لە سەقز و دەوروبەری، عومەرخان ئامیرهێزی لەشکری کۆماری کوردستان بووە، نزیکەی ١٧ نامەی بۆ دڵنیاییکردنی دەرباری شا لە دڵسۆزیی خۆی بۆ شای ئێران ناردووە و خۆی بە سەرازی دەرباری شای ئێران ناساندووە و بەرهەڤیی بەجێگەیاندنی ئەرك و فەرمانی دەرباری لە خۆی نیشان داوە. هەروەها ئەو نامانەش ئێستا لە مۆزەخانەی ئەرتەشی ئێران پارێزراون.

جێگەی ئاماژەپێکردنە کە سەرداری دێبۆکری، عەلی یار لە یەکێك لەو نامانەدا چۆنیەتیی چوونیان لە گەڵ پێشەوا قازی محەمەددا بۆ باکۆ و ئازەربایجانی رووسیا و کۆبوونەوەکانیانی بێ کەموکورتی و بە تێروتەسەلی بۆ دەرباری شای ئێران نووسیوە و ئەوانی لێ ئاگادار کردۆتەوە.

ناکرێ لەم نووسینە کورتەدا باسی ناوەڕۆکی هەموو ئەو نامانە بکەین، بەڵام لە رووی کاریگەریی ناوەڕۆکی نامەکانەوە، ئەم نامەیەی عەلی یار گەورەترین گورز بوو لە کۆمار و لە رووی رێژەی نامەکانیشەوە، عومەرخانی شکاك زیاترین رێژەی (ژمارە) نامەی بۆ دەربار نووسیوە.

هەر دوابەدوای دەرچوونی لەشکری رووس لە کوردستان، عومەرخان بە پەلە نامەیەکی بۆ شای ئێران نووسیوە و لەو نامەیەدا داوا لە شا دەکات هەرچی زووترە ئەرتەشی ئێران بگاتە کوردستان و نووسیویەتی وا من بە خۆم و هەموو هۆزی شکاکەوە وەکوو سەربازی شای ئێران بەرهەڤین فەرمانەکانتان

سەروان کیۆمەرس ساڵح دەنووسێ:

دوای تەواوبوونی دادگاییکردنی قازییەکان و لەسێدارەدانیان، تەواوی ئەو رووداوەم بێ کەم و زیاد لە مانگنامە (ماهنامە)دا و هەواڵە گرنگەکانیشم لە وێژەنامەکەی (تاج کیانی)دا چاپ کرد، بەڵام پێش ئەوەی بکەوێتە بەردەست و بڵاو ببێتەوە، منیان بۆ دادگای ئەرتەش بانگ کرد، لە وێ پێیان گوتم تۆ بە تاوانی ئاشکراکردنی نهێنییەکانی دادگاییکردنی قازییەکان تاوانباری و پلەی سەروانییان لێ کردمەوە و ساڵێکیش بەندیخانەیان بۆ بڕیمەوە، بەو هۆیەوە هەم چاپکردنی (ماهنامە) راگیرا و هەمیش ئەو هەواڵانە بڵاو نەکرانەوە.

کیۆمەرس ئەم زانیارییانەی دوای بەربوونی لە بەندیخانە لە ژمارە (٧٥)ی (ماهنامە)کەدا لە ساڵی (١٩٤٦) بڵاو کردوونەتەوە، هەروەها بەر لەوەش لە ژمارە (٦٦)ی ساڵی (١٩٤٦)ی ئەو (ماهنامە)یەدا دەنووسێ:

دوای کۆتایی هاتنی شەڕی دووەمی جیهانی و گەڕانەوەی لەشکری رووس و ئینگلیز بۆ وڵاتی خۆیان، ئەرتەشی ئێران کەوتە جموجۆڵ و جووڵانەوە.

هەر ئەو هەواڵنێرە لە ژمارەکانی (٤٤ تا ٦٤)ی ئەو (ماهنامە)یەدا رووداوەکانی ساڵی (١٩٤٣ تا ١٩٤٦)ی کوردستان و ئازەربایجان دەگێڕێتەوە و دواتر لە سەر کۆماری کوردستان و ئازەربایجان، بە دوور و درێژی دەنگوباس و شتی ورد و گرنگی بڵاو کردۆتەوە کە هەندێکیان ئەرشیف و هەندێکیشیان چاپ کراون.

لە زۆربەی ژمارەکانی (ماهنامە)دا، نامەی وەفاداری و دڵسۆزیی سەرۆک هۆزی دێبۆکری، عەلی یار ئەسعەد و سەرۆک عەشیرەتی مامەش، قەرەنی ئاغای عەشایەر و رەشید بەگی هەرکی و حەسەن تێلۆ و قوقیاس مامەدی و نووری

گرنگیی ئەم بەڵگەنامەیە لەوەدایە کە سەروان کیۆمەرس ساڵح، وەك هەواڵدەرێکی چالاك و چاپووك لە دادگاییکردنی پێشەوا قازی و سەدر و سەیفدا بەرهەڤ بووە و لە بەر ئەوەی خوشکەزای (سەرلەشکر فەرەیدوون جەم) بووە کە ئەویش مێردی (شەمس)ی خوشکی شای ئێران بووە، بۆیە جێگەی باوەڕ و دڵنیایی دەرباری شای ئێران بووە.

لەم سۆنگەیەوە هەموو بەڵگەنامە و نامە نهێنییەکانی شای ئێران لە ژێر دەستی سەروان کیۆمەرس ساڵحدا بووە، تاکوو ناوە ناوە هەندێکیان لە نامیلکەی تایبەتیدا بۆ بەرپرسانی سەربازیی چاپ بکرێن، یاخود دوای ڕێکخستنیان ببرێنە نامەخانەی نهێنیی لەشکری ئێران.

دیارە ئەم چاپکردنەش بۆ وەردان و دلگەرمیی ئەفسەرانی لەشکری ئێرانی بووە، هەروەها ئێستاشی لە گەڵدا بێت، ئەو نامانە یاخود ئەو ڕۆژنامانەی چاپ دەکرێن، لە کۆتیی ساڵدا هەموویان کۆ دەکرێنەوە و لە لایەن (ئەرشیفخانەی سەرکردایەتیی لەشکر)ەوە چاپ دەکرێن و دەپارێزرێن.

ئەوەی بەردەستتان، وەك لە سەرەوە ئاماژەمان پێ دا، دەقی ئەو نووسراوەیە کە لە دەقی دادگاییکردنی قازییەکان وەرگیراوە و لە وێژەنامەکەیدا چاپ کراوە.

بەدرەدین ساڵح

١٠ی تەمووزی ٢٠٠٠

دەقی دادگایی کردنی پێشەوا قازی محەمەد و سەرد و سەیفی قازی

دەربارەی دادگاییکردنی پێشەوا قازی محەمەد و سەدر و سەیفی قازی گەلێك وتراوە و نووسراوە، دیارە ئەم نووسینانە دوو دەستەن، دەستەی یەکەم ئەو کەسانە نووسیویانە کە ویستوویانە ئەو مێژووە بشێوێنن و بە پێی بەرژەوەندیی دوژمنانی کورد، ناکار و قسە و شتی دوور لەو زتەیان نووسیوە و هەوڵیان داوە ئەو مێژووە بشێوێنن، دیارە بەری ڕۆژیش بە بێژینگ ناگیرێ و بەڵگەش بۆ ئەم قسەیەمان دڵسۆزی و خۆشەویستیی گەل کوردە بۆ قازیەکان و ڕێبازە پیرۆزەکەیان.

دەستەی دووەمی ئەو نووسەرانەش ئەو بەڕێزانەن کە لە ڕووی دڵسۆزییەوە شەونخوونییان چەشتووە، تا کون و کەلەبەرە شاراوەکانی ئەو کارەساتە، واتە رووخانی کۆماری کوردستان و لەسێدارەدانی پێشەواکەی ئاشکرا بکەن، بەڵام ئەوەی کە ئێستا لە بەر دەستی ئێمەدایە، دەقی ئەو نووسینەیە کە بە قەڵەمی سەروان (کیۆمەرس ساڵح) هەواڵنێری گۆڤاری ئەرتەشی شاهەنشاهیی ئێران کە دیارە خۆی لە دادگاییکردنەکەدا ئامادە بووە، نووسراوە و دەقی ئەم دادگاییکردنەی وەکوو وێژەنامەیەکی تایبەت چاپ کردووە بە مەبەستی ئەوەی بە سەر ئەفسەرانی گەورە و جێگەی دڵنیایی شا و پایەبەرزانی حکوومەتدا دابەش بکرێ، ئەویش زۆر بە نهێنی.

هەر لەم ژمارە تایبەتییەدا کە بە ناوی (تاج کیانی) نووسراوە و لە (ستاد) بنکەی ناوەندیی فەرمانداریی ئەرتەش ئەرشیف کراوە، ئێمە وەرمان گرتووە و پاچڤەی سەر زمانی کوردیمان کردووە.

کتێب: سەرۆك کۆماری کوردستان لەبەردەم دادگادا

بەرهەڤکردن : بەدرەدین ساڵح

گۆڕینی بۆ کرمانجی : سامی ئەرگوشی

چاپ : مافی چاپکردنەوەی ئەم چاپە بە وەزارەتی رۆشنبیری بەخشراوە

بەرگ : کاوە فاروق

نەخشەسازی ناوەڕۆك: ئەژین عەبدوڵڵا

چاپ : چاپی سێیەم

چاپ : چاپخانەی وەزارەتی رۆشنبیری - هەولێر

تیراژ : ٢٠٠٠ دانە

وەزارەتی رۆشنبیری
فیستڤاڵی کۆماری کوردستان

سەرۆك کۆماری کوردستان

لەبەردەم دادگای ئێراندا

بەرهەفکردنی : بەدرەدین ساڵح
گۆڕینی بۆ کرمانجی : سامی ئەرگوشی

هەولێر – ٢٠٠٧

سەرۆک کۆماری کوردستان
لە بەردەم دادگای ئێراندا

بەرهەڤکردنی:

بەدرەدین ساڵح

گۆڕینی بۆ کرمانجی:

سامی ئەرگۆشی